




Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:


Bi derketina cîhanê em dê bibin Xwedî-dewlet



K rîza şer a Tirkiye û Sûriyeyê bi peymanekê bi dawî hat. Rayedarên tirk wê wekî serkeftineke mezin bi nav dikin. Lê hinek kes balê dikişînin vê rastiyê ku zêde cudahiyeke di navbera vê peymanê û ya 1992'yan de nîn e. Piştî Sûriyeyê îcar çapmeniya tirk li hemberî Rûsyayê dest bi kampanyayekê kir. Sedema vê yekê jî wekî germbûna têkiliyên kurdan û Rûsyayê tê destnîşankirin. Li aliyê din Serokê Giştî yê PKK'ê çalakiyên dawîn wekî komployeke mezin bi nav kir û da zanîn ku wî ev komplo bi avê de biriye. Serokê PKK'ê diyar kir ku ew li Kurdistanê ye. (R. 3)

Hevpeyvîn: Em di nava deryaya kurdî de noqav dibin - Rûpel 8-9	Nejdet Buldan: Kî ye terorîst? r.5
Şehîd-Bîranîn: Em aştîyeke li gorî dilê xwe dixwazin - Rûpel 6	Mirhem Yîgît: Cegerxwîn r.7
Wêje: Ê me mirin dereng hişt - Rûpel 10	Bekir Şivanî: Qeyranî Tirkiye-Sûriye r.11
Erdnîgarî: Bajarê Cizîrê - Rûpel 16	Hasan Kaya: Şehîd stêr in r.13

Azadiya WELAT



SAMÍ TAN

Têkiliyên navneteweyî û serdestên tirk

Serdestên tirkan ji mêj ve ji bo çareserkirina kêşeyên xwe yên hundirîn, êrîşê dibin ser derûcî-naran. Hê di dema Osmaniyan de tevgerên azadîxwaz ên gel û çînen bindest bi dewletê din ve dihatin girêdan. Lewre di lîteratûra serdestên tirkan de gel û çînen bindest ne xwedî îrade ne; ew tu car bi bîr nabin serxwebûn û azadiyê. Ji bo vê yekê divê ji hêla dewleteke din ve tîrên fitkirin. Ew yek, piştqewîbûna serdestan bi dek û dolabên xwe û pergala hêvotîne ji nîşan dide.

Serdestên tirkan xwe li hemberî gel û çînen bindest wisa bi rêxistin kirine ku gel nikarin wisa bi hêsanî li hemberî wan serî rakin. Heke hêzek derkeve jî, ew dikarin bi dek û dolaban zora wê hêzê bibin. Heke ew, pir di tengasiyê de bimînin jî, hêzên împeryalist tîrên hawara wan. Lê dîroknivîsên tirk tu car nabêjin filan dewleta me peyka împeryalistan bû. Li aliyê din heke tevgerê

azadîxwaz têkiliyê bi dewletên din re deyne, wekî xulamê wê dewletê tî navandin.

Îro jî dewleta tirk hezar bertil û xûgî dide dewletên din, rejîmê xwe bi temamî bi dest împeryalist û siyonîstan ve berdaye. Kes nabêje, ew peyka împeryalist û siyonîstan e, lê dema kurd silavê bidin yekî jî ew dibin xulamê wî.

Tiştêkî balkêş jî ev e; hestên şovenîst û regezperest di binhişna dagirkeran de wisa şax vedane ku, ew dikarin ji bo vê yekê serî li hemberî cîhanê rakin. Hêzên împeryalist jî bi vê yekê baş dizanin û heta hin caran ji bo ku daxwazên xwe pêk bînin, bi vê tamara dewleta tirk digirin.

Li gorî ku tê gotin, ev çalakiyên dawîn ên dewleta tirk jî parçeyê komployê împeryalistan e. Ev plan ji aliyê Amerîkayê ve hatiye gerandin. Tê ragihandin ku Amerîka bi vê planê dixwaze Sûriyeyê ber bi xwe bikişîne, da ku wê ji

bixe nava plana aştiya ereb û Îsraîlê. Her wiha di nava vê planê de aştiyêke sexte ya kurdan jî heye. Li gorî vê planê dê li başûrê Kurdistanê dewleteke federe pêk were, li Bakur jî hinek mafên çandî bîrên dayîn. Di vê planê de jîholêkirina Tevera Azadîxwaz ya gelê kurd heye.

Tevera Azadîxwaz a gelê kurd jî ji bo ku dek û dolabên dagirker û împeryalistan pûç derxe, xebatê dike. Tever hêza xwe ji gelê kurd distîne. Lê heta tevgerê di qada navneteweyî de neyê pejirandin, nikare tiştêkî bi dest bixe. Ji bo vê yekê jî divê xebatên diplomatîk bi şarezahî û zanatî bimeşîne. Rast e, çalakiyên diplomatîk nikarin tevgerê bigihêjin encamê, lê moralê didin gelê di şer de û her wiha jî ji tevgera gelê hêzê distînin. Îro bi geşbûna tevgera gelê kurd re, doza neteweyî di qada navneteweyî de cihê xwe digire. Tiştê ku herî zaf dagirkeran ditirsîne jî ew e.

Tevger hêza xwe ji gelê kurd distîne. Lê heta tevgerê di qada navneteweyî de neyê pejirandin, nikare tiştêkî bi dest bixe. Ji bo vê yekê jî divê xebatên diplomatîk bi şarezahî û zanatî bimeşîne.

Şerxwaz bi ser nakevin

Ferhengok

bager: firtina	nêçîrvan: seydvandan
berfa pûkê: berfa sivik û xubarî	ge: cihê ku çêlek lê tî dotin
berfedîn: komikên berfê	nelibarî: nakokî, nelîhevî
berzekirin: windakirin	newa: awaz, melodî
bevaban: çol û cihê xalî	nexşe: xerite
bûkaberfîna: kardanadamî	nijdevan: çete
daxbar: xemgîn	nimandin: temsîlkirin
dewlemendî: zengînî	noqavbûn: binavbûn
dozandin: dîtin	peşk: hebên baranê
fêrbûn: hînbûn, elimîn	pêşnûma: proje, tasarî
gadoş: firaqên axîfî	pîrelk: çim
gencîne: xezîne	pûg: kar tipîsi
gijlok: zipik, xilolîk (dolu)	qinyat: bawerî
gîzre: dara ne hişk ne ter	reşbîn: bedbîn (karamsar)
hincet: bahane heyam	sazûman: pergal, sîstem
rêbaz: azîne, metod	sinc: ehleq
karesat: bobelat, felaket	sîwan: semsiye
karîger: etkili, etkin	siyer: stêr, loda nivînan
keviyên berfê: berfa ku havîne li serê çiyê dinimîne.	şarezâ: pîspor, tîrzanî
konevanî: siyaset	şilope: berfşo
kulî: hebên berfê	şo: nexweşiya tîger
lehî: laser, lêmişt	şofeker: noker (işbirlikçi)
lûtke: gopîtk, zirve	tûtîk: dendîka hejîrê
mesîlk: newalên biçûk	xelûz: rijî, komir
	xunav: çîseleme
	zargotin: folklor
	zekem: bapêş, arsim, grîp

GIRTÎGEHA BARTINÊ

Li ser Rojhilata Navîn dîsa ewrên reş û tarî digerin. Ji dev û lêvan "şer" dibare. Ewrên şer konê xwe li ser xaka me vedigirin û dîsa dilopên xwe yên qirêj dimiqutînin nava gelên herêmê.

Komara Tirk dîsa serê vî karî dikişîne. Jixwe êdî şer û komara faşîst bûne mîna goşt û hestî. Yek bêyî yê din nabe. KT, di van rojên dawîn de bi zîmanekî qirêj ji her aliyê ve gefan li dewleta Sûriyê dixwe û li hemberî wê propagandayêke derî mirovahiyê dimeşîne. Dibêje; "tu çima şervanên kurdan diparêzî û alîkariyê didî wan. Divê tu Serokê PKK'ê radestî me bikî û hwd."

Belê. Ev şewazê ku agir jê dibare şewazê Komara Tirk e. Ev yek neçarî û bêzariya wan dide der. Ji neçarîya xwe berê xwe didine Sûriyeyê. Ji bo wan hincet her dem amade ne. Carna dijminên neteweyî, carna dijminên dîrokî carna dijminên pêserojê carna yên rabîrdûyê... Di rojevê de kîjan li bejn û bala wan were, wê ji xwe re dicibînin û li gorî wê qîlên xwe tûj dikin û berê xwe didine gelan.

Her çiqas ji bo şer, bikin qêrîn û hewar jî, baş tê zanîn ku ew li ber

têkçûna mez. 1 in. Hemû deriyên derketinê lê hatine dadan. Di nava çirava şerê qirêj de xwe digevizîne. Lê her diçe bêtir difetise. Lewre birîn di hundir de ye. Lê naxwazîn ve yekê qebûl bikin. Lewre hebûna wan bi vê ve girêdayî ye.

Îcar digel vê rewşa xerab ji bo çî Komara Tirk li hemberî Sûriyê şerxwaziyê dike? Gelo ewqasî bihêze e, mîrxas e? An bînc xwari-

Wekî ku şerê li hemberî gelê kurd ne bes bû niha jî li hemberî gelê ereb awazên şer diqîrin. Divê bê zanîn ku gelên Rojhilata Navîn serê xwe li hemberî pest û kotekiyên faşîsên tirk, siyonîstên Îsraîl û împeryalistên Amerîkayê natewînin.

ye, serî lê geriyaye? Na! Sedem dîsa şerê rizgariyê û nakokiyên hundir in.

Di dîrokê de jî pir hatiye dîtin; carna hêzên serdest di nava xwe de dixitimin, hebûna wan dikeve xetereyên mezin. Di vê niqte de ji bo xetereya hundirîn biferikînin an sivik bikin, berê xwe didine derve û şerên derewîn derdixin. Împaratorê Romayê Sezar bi niyeteke wisa amadekariya Sefera Rojhilat kir, lê ev armanca wî hate fêmkirin û ew kuştin. Bi ser neket. Dîsa di sala 1870'yî de beriya Komûna Parisê

tenê ji bo kedkar û proleter bi ser nekevin, Fransayê digel rewşa xwe ya xerab li Prûsyayê şer îlan kir û tîk çû. Împaratorê Fransayê tevî artêşa xwe dil ket. Bi ser de jî Herêma Alsas Lorain radestî (teslim) Prûsyayê kirin.

Rejîma faşîst a tirk jî ne biyanê ve rêbazê ye. Beriya niha bi dehan car krîzên wisa anîn rojevê. Carna Kîbrîs, carna Zinarên Kardak, carna jî tirkên Bûlgarîstanê û hwd. kirine hincet, kampanyayên şoven di nava gel de dane destpêkirin.

Wekî ku şerê li hemberî gelê kurd ne bes bû niha jî li hemberî gelê ereb awazên şer diqîrin. Çi di vî şerî de bi ser ketin, nih jî dora şerê din e! Lê divê ev yek baş bê zanîn ku gelên Rojhilata Navîn serê xwe li hemberî pest û kotekiyên faşîsên tirk, siyonîstên Îsraîl û împeryalistên Amerîkayê natewînin.

Gelên me wê heta dawiyê li hemberî şerên qirêj rawestînin. Wê helwesta xwe derxin holê. Gelê ereb jî niha ve helbesta xwe daye xuyakirin. Gelên cîran jî wê zilma KT nepejiirin. Ev yek tevî gelê kurd xurtkirina blokeke xwezayî ya anti-faşîst, anti-siyonîst, anti-împeryalist e. Digel hevalbendiyên din destpêkirina şerêkî wisa tîkçûna KT'ê ye.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan: Bi derketina cîhanê em dê bibin xwedî-dewlet

Li ser helwesta Sûriyê Öcalan ev nirxandin kir: "Tu sedem nîn e ku Sûriye wekî polisê Tirkîyê tevbigere û ez ne bawer im ku wisa tevbigere jî." Öcalan, bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Em bi derketina ji Enqereyê bûn xwedan partî, bi çûna Rojhilata Navîn bûn xwedan artêş û bi derketina cîhanê jî em dê bibin xwedan dewlet."

Krîza di navbera Tirkîyê û Sûriyê de, bi peymanê ku rayedarên tirk wekî serkeftin nîşan didin, qediya. Li gorî agahiyên ku di çapemeniya tirk de derketine, dewleta tirk bi vî polîtîkaya xwe, ya ku navê "rêveberiya qeyranê" lê dikan, serkeftineke mezîn bi dest xistiye. Hinek nivîskar dibêjin, divê ew serkeftin bikeve nava rûpelên pirtûkên dersan. Di bidestxistina vî encamê de giraniya artêşê tê zimên û tê xwestin ku prestîja generalan berztir bibe. Lewre krîzê bi daxuyaniya generalekî dest pê kiribû.

Di nava rûpelên çapemeniya tirk de, ji bilî sermestîya vî "serkeftinê" tiştek xuya nake. Di nava nivîskarên çapemeniya tirk de bi tenê nivîskarê Rojnameya Sabahê Cengiz Çandar bi çavekî objektîf li mijarê nihêrtîye û şik û guman xwe li ser "serkeftina" navborî derbiriye. Li gorî Çandar tu ferq di navbera peymanê ku sala 1992'yan di navbera her du dewletan de hatiye girêdan û peymanê iro de nîn e. Derdorên kurd jî vî dîtina Çandar di cih de dibînin û diyar dikin ku dewleta tirk li pey komployeke mezîn bûye, lê bi ser neketiye. Niha dixwaze bi vî peymanê têkçûna xwe veşêre.

Rayedarên tirk, niha jî berê xwe dane Rûsyayê. Li gorî daxuyaniyên Serokwezîrê Tirkîyê Mesut Yılmaz Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li Moskovayê bi cih bûye. Li ser vî yekê çapemeniya tirk dest bi kampanyayê li hemberî vî dewletê kir. Her çiqas rayedarên Rûsyayê didin zanîn ku Öcalan ne li welatê wan e jî, çapemeniya tirk dest bi afirandina senaryoyên li ser Öcalan kirine. Komîteya Jeopolîtîk a Dûmayê hefteya çûyî bang li Neteweyên Yekbûyî kiribû ku tevkujiya li ser gelê kurd bide rawestandî. Her wiha, komîteya navborî êrişên li ser Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan jî şermezar kir û ew wekî dûmahîka polîtîkaya tevkujiyê bi nav kir.

Li gorî nirxandina derdorên siyasî yê kurd tiştê ku dibê sedema kampanyaya çapemeniya tirk, germbûna têki-

liyên kurdan û Rûsyayê ye. Bo nimûne, Dûmayê Rûsyayê di civîneke ku roja 9'ê rezberê pêkanîbû de piştvanîya xwe bo agirbesta PKK'ê diyar kiribû. Biryara piştvanîyê bi dengê 293 endamên Dûmayê hatibû pejirandin.

Têkiliyên Rûsya û kurdan germ dibin

Van rojan kêşeya kurd û krîza Sûriyê û Tirkîyê di nava rûpelên çapemeniya rûsî de ji xwe re cihêkî berfireh dibîne. Mirov dikare li vir çend nûçe û gotaran wekî mînak rêz bike.

Vrêmîta, 14'ê kewçêra 1998'an: Her çiqas berê jî li ser Xeta Boriya Neftê ya Bakû-Ceyhanê di çapemeniya Tirkîyê de bi guman dihate axaftin, lê tesliya Enqereyê neketiye, lewre jî hewl dide ku bi lez pirsgrêka kurdî bi rêbazên xwe çareser bike.

Rojnameya Noviyê Îzvestiya roja 10'ê kewçêrê bi Berpîrsê ERNK'ê Mahir Welat re hevpeyvînek kiriye. Hevpeyvîn jî hêla Sêrgey Geilîly ve hatiye kirin.

Mahir Welat têkiliya Rûsya û kurdan wiha dinirxîne:

"Hem xetên boriya neftê û gazê, hem jî Riyên Hermûşê yê ku ji bo wê tî avakirin, ji bo ku Rûsyayê li Kafkasya û Asyaya Navîn tengav bikin û ji wan herêman derxînin, tîne sazîkirin û ew di nava Kurdistanê re derbas dibin. Têkoşîna me rê asteng dike. Welatên ku van projeyan pêk tînin, siyaseta li dijî kurdan dimeşînin. Hem dostên me hem jî dijminên me yek in. Bi texmîna min Rûsya divê berê siyaseta xwe ya nû bide aliyê kurdan. Divê berê pêşîn Rûsya pirsgrêka kurdî di warê navneteweyî de bi awayê siyasî biparêze."

Rojnameya Nêzavîsimaya Gazêta di hejmara xwe ya roja 19'ê kewçêrê de cih daye navê 15 dewletên ku divê li gorî rêznameya NATO'yê bêne bombabarankirin. Di nava wan dewletan de Tirkîye jî heye. Sedema vî yekê jî wiha tê ravekirin: "Bi girseyî bînpêkirina

mafên kurdan, operasyonên leşkerî yê cezakirinê li ser sivîlan, bînpêkirina xala 1178 û 1179 a Peymana Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî."

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan: Ez li Kurdistanê me

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan çalakîyên dewleta tirk ên li hemberî xwe wekî komployeke mezîn bi nav kir û da zanîn ku wan ev plana nebixêr di avê biriye. Li gorî daxuyaniya Öcalan, hêzên împeryalist û dagirker bi vî êrişê xwestine li Rojhilata Navîn şerekî bidin destpêkirin. Serokê PKK'ê diyar kir ku wî şerî dê rê li ber şerê cîhanê vekira, wî got: "Ji ber ku me ev plana bêyom bi avê de biriye, em jî gelên herêmê re dibêjin derbasî be."

Öcalan bersiv da gotegotên li ser cihê ku ew lê dimîne û da zanîn ku ew li Kurdistanê ye. Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan li ser têkiliyên di navbera PKK û Sûriyê de jî nirxaneke balkêş kir. Wî da xuyakirin ku wan tu caran xwe nespîtiye vî dewletê û tu têkiliyên wan ên fermî bi vî dewletê re tune ne. Serokê PKK bi bîr xist ku bi sedan endamên PKK'ê niha di girtîgehên vî dewletê de ne û heta ew bi xwe jî sê caran hatiye binçavkirin.

Öcalan bal kişand ser rêxistîbûna gelê kurd ê li Başûrê Biçûk û Lubnanê û got: "Me gelê xwe yê li vî herêmê baş bi rêxistinî kiriye û car caran em diçin serdana gelê xwe." Li ser helwesta Sûriyê jî Öcalan ev nirxandin kir: "Tu sedem nîn e ku Sûriye wekî polisê Tirkîyê tevbigere û ez ne bawer im ku wisa tevbigere jî." Öcalan, bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Em bi derketina ji Enqereyê bûn xwedan partî, bi çûna Rojhilata Navîn bûn xwedan artêş û bi derketina cîhanê jî em dê bibin xwedan dewlet."

Li aliyê din raya giştî ya kurd reaksiyoneke tund li hemberî vî komploya



me -
zin nîşan da, li gelek bajarên Ewropayê bo piştvanîya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, meş û xwepêşandan hatin lidarxistin. Her wiha 5 girtiyên ji doza PKK'ê û girtiyeke ji doza DHP'ê jî bo şermazarkirina vî komployê agir bi bedena xwe xistin. Ji wan girtiyan du heban jiyana xwe jî dest da.

Sewr destpêka perçebûna Kurdistanê ye

Li aliyekî biryara avakirina dewleta Ermenîstanê tê standin ku, bajarên Kurdistanê yên mîna Wan, Bedlîs, Erzirom di nav de ne, li aliyê din jî ji bo ku li dora Amed, Riha û Cizîrê mafekî pir teng (li gorî wan nîvserxwebûn) bidin kurdan, biryarê distînin. Ev biryar bi serê xwe perçebûna Kurdistanê ye. Ev peyman di pratîkê de perçebûna Kurdistanê ye û li ber Lozanê rêvekirin e.

AHMET HÜSEYİN

Konevaniyên ku di destpêka vê sedsalê de li ser Kurdistanê hatine meşandin, pêwîst e ku baş werin lêkolandin û fêmkirin. Taybetiya van konevaniyan a herî berbiçav bêsinciya wan e. Îngilîstan û Fransayê gelên me ji xwe re kirine pêlîstok û li gorî berjewendiyên xwe yên bi qirêjî gelên me listine. Bêsinçî û bêwijdaniya wan bêtir di Sewrê de zelal dibe. Serokê Komara Tirk Süleyman Demirel li ser nêzîktêdayîna Ewropayê ya der barê pirsgirêka kurdî de wiha dibêje: "Tiştên ku bi Sewrê pêk neanîn, dixwazin bi PKK'ê pêk bînin". Ev gotin, ji xeynî berrevajîkirina büyerên dîrokê û rastiye tiştêkî din îfade nake.

Di kakilê Sewrê de parçebûna Kurdistanê heye

Xalên 62-64'an ên Peymana Sewrê di rastiye de li ber parçekirina Kurdistanê û qirkirina kurdan îfade dîke. Li aliyekî biryara avakirina dewleta Ermenîstanê tê standin ku, bajarên Kurdistanê yên mîna Wan, Bedlîs, Erzirom di nav de ne, li aliyê din jî ji bo ku li dora Amed, Riha û Cizîrê mafekî pir teng (li gorî wan nîvserxwebûn) bidin kurdan, biryarê distînin. Ev biryar bi serê xwe parçebûna Kurdistanê ye. Ev peyman di pratîkê de parçebûna Kurdistanê ye û li ber Lozanê rêvekirin e. Dema wan dît li dijî Sewrê ji kurdan berkeke hêzdar derneket Peymana Lozan girêdan. Ger Sewr, ji aliyê kurd û ermenîyan ve bihata redkirin, negengaz bû ku Lozan pêk bihata. Ger em berbiçav bikin, qirkirinê herî mezin li ser Kurdistanê piştî Sewrê pêk hatine. Îngilîz û Fransîyan piştî girîf dane tirkan

Di navenda konevaniya Îngilîz û Fransîyan a destpêka vê sedsalê de perçebûna gelên Rojhilata Navîn hebû. Piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn nexşeya siyasî ya herêmê ji aliyê Îngilîz û Fransayê ve ji nû ve, hate çêkirin. Ew nexşeya ku dane çêkirin


bû sedema lawazbûna gelên me û piştê jî bû sedema nedayîna bersîveke rast li hemberî konevaniyên KT'ê. Ev pêşnûmeya nexşeya siyasî li dijî rastiya gelên me ye û bi du-bendiyan dagirtî ye.

Ger Îngilîz û Fransîyan digel Italyayê bixwestana ku Sewrê têxin jiyane jî, nikaribûn. Çima ku li aliyekî Şoreşa Rûsyayê bi ser ketibû, li aliyekî din jî ev dewletên împeryalist piştî şer lawaz bûbûn û ditirsîyan ku KT jî destê wan here, bibe hevalbendê Sovyetê. Yanê ev peymanêke ji berçûyî bû. Gotina Serokwezîrê Îngilîstanê Lloyd George ya bi rengê: "Sewr, projeke bêhêvî ye" rastiye zelaltir dîke.

Xala 64. Bi kînahî; heta salekê, ger kurd bixwazin ji Osmanîyan qut bibin, ger wê daxwaza xwe ji Konseya Civata Nete-weyan re bêjin û Konseya Civata Nete-weyan bawer bike ku, kurd dikarin xwe bi rê ve bibin, dê Osmanîyan li gorî daxwazên kurdan saz bike. Berî her tiştî, bi vê xalê, bi êşkere li gelê me dikenin. Ma kîjan gel azadî û serxwebûna xwe naxwaze? Serhildanên dawîya sedsala 19'an û heta destpêka vê sedsalê ji bo çî pêk hatin? Kurdan kengê xwestibû ku bi Osmanîyan re bijî? Diyar e ku xala 64. ev li gelê me tinazkirin e.

Hinek serokên Kurdan û rêxistina ermenîyan, Taşnak bi vê listika Îngilîz û Fransîyan dixapin. Kurd bi Sewrê bawer dikin, Taşnak jî heta îro îdiaya sinorên xwe yên heta Amedê didomîne.

Di vir de helwesta Fransayê balkêş e. M.S. Lazarev di pirtûka xwe ya bi navê "Împeryalizm û Pirsgirêka Kurd" (1917/1923) de diyar dîke Fransa, piştî ku bi tirkan re Peymana Franklain Bujan (20 kewçêr 1921) şanênaw dîke, Sewrê red dîke û hikûmeta Enqerê dinase. Fransa bi vê



Nûnerê welatên ku Peymana Lozanê îmze kirine. (24 tîrmeh, 1923)

konevaniyê, durûtî û bêsinciya xwe êşkere dîke û bi gelê me dilîze. Bêguman ji rêxistinbûnê û serokatîyeke nûjen bêparbûn, gelê me dixwe ve rewşê.

Sewr, nayê pejirandin, tê redkirin û mehkûmkirin

Tevî ku "şerê me li hemberî împeryalizmê jî şerê Vietnamê mezintir e." (Serok) jî, Süleyman Demirel dibêje ku, "dixwazin Sewrê ji nû ve bi rîya PKK'ê vejin." Demirel bi van gotinên xwe yên demogojîk dixwaze ku çembera li dora KT'ê çêbûye, veşêre. Par (di dema Trêna Aştiyê de), dîsa rayedarên KT'ê ev, gotibûn. Serok wê demê bersîveke wiha dabû: "Dixwazin me wekî Sewrparêz nîşan bidin lê em Lozanê jî Sewrê jî paşverû dibînin."

KT jî bo xweparastinê, êrîşkirina her kesên ku qala kurdan dîke ji xwe re kiriye konevaniyeke bingehîn. Ew dibêjin ku "Almanya bi destê PKK'ê dixwaze Sewrê têxe jiyane." Wekî ku Almanyayê PKK qedexe nekiribe û Tirkiyeyê jî alîkariya çekan ji Almanyayê negirtibe, tevdiqere. Ev nîrxandina Demirel domandina helwesta 75 salî ye. Yanê kurd nikarin bibin desthilatdar, vîna wan nîn e. "Lê belê gelê me bi qasî ku xwe dinase, êdî rastiya dîrokê jî dinase. Di bin rêberiya PKK'ê de, bi şerê gerîla dîroka Kurdistanê bi her aliyê ve zelal dîke. Sewrê jî Lozanê jî didarîzîne û mahkûm dîke. Çimkî bi pêkhatina Sewrê re vîna gelê me dernakeve holê. Gelê me dixwaze vîna xwe bi awayekî azad binimîne. Sewr rastiya kurdan nanimî-

ne.

Encam;

1. Sewrê; pêşnûmeya nexşeyêke siyasî li gorî berjewendîya Îngilîz û Fransîyan saz kir, îro bi şoreşa Kurdistanê re pêwîstiya sazîna pêşnûmeya nexşeyêke li gorî berjewendîya gelan (Nexşeya Federasyonê) derketiye holê.

2. Sewr; li pêş azadiya gelan asteng bû û xapandina gelan bû. Ji bo vê jî girîng e ku gelên me bi xurtî di rîya ku şer vekirî ye de bimeşin.

3. Sewr; di navbera gelan de reşandina tovên neyartiyê bû. Lazim e ku ji bo serxwebûn û azadiya gelan ev tov ji ruh û mêjiyan bê avêtin

4. Pêwîst e ku Sewreke alternatîf pêk bê.

5. Îro împeryalizm dixwaze careke din gelên me ji rêberê wan, PKK'ê dûr bixe. Bi destê kesên remormîst û şoleker bi rastiya gelên me bilîze. Ji bo valaderxistina vê konevaniyê, pêwîst e ku hêj bi xurtî girêdan bi serokatîya şoreşê ve pêk bê.

6. Împeryalizm dixwaze bi dayîna hin tiştên biçûk gelên me bixapîne. Lê pêwîst e ku ev fersenda ku ketiye destê gelên me bi tiştên biçûk, bi hesabên biçûk neyê tunekirin. "Ger mezin were fikirin, mezin were xwestin tu hêz nikare wê fersendê jî destê gelên me bigire." Çimkî, êdî em xwedî serokatîyeke dîrokî, rêxistîneke înternasyonal, vîneke bi hêza gelan xurtbûyî û xwedî nêrîneke rast in. Yê xwedî nêrîneke rast di dîrokê de jî zû bi zû nakevîn şaşitiyên mezin. Kes û gelên wiha tu car tek naçin, her dem bi ser dikevin.

Rêzimanê kurmancî

- Wane 35 -

SAMÎ BERBANG

Ravekariya bi cînavkan

Di vê mijarê de tiştêk bi harîkariya cînavkan tê ravekirin. Wekî;

*Mala min
Gundê wan
Hevalê te
Xwişka wan
Hevrêya wî*

Dîsa tê dîtîn ku hemû cînav ji koma tewandî ne.

Ravekariya zincirî

Dema ravekirina tiştêkî bi alîkariya çend tiştan bibe, ravekariya zincirî derdikeve holê. Tiştên ku tiştêkî din rave dikin, dikarin bi alîkariya gihaneka "Û" bigihêjin. Mînak:

*Hevala çavşîn û porzer
Dayika dilşewitî û keserkûr
Yan jî dikare bi alîkariya veqetandekê pêk were. Wekî mînak;
Hevalê bejinzirav ê çavşîn
Destbirakê lezgîn î bejinkurt
Keça porzer a destbiçek
Dayika biçefî ya li pêş
Mirovê serkundirê serguri
Fermendarê çavsor î xwînxwar*

Hevok

Piştî ku dawî li birên hevokê hat, mirov dikare, derbasî hevokê bibe. Dîti-

nek, ramanek û rûdanek bi hevokê tê nîmandin. Hevok bi tîpa girdek dest pê dike û li gorî wateya wê bi xal, baneşan û xalecotê diqede. Hevok dikare ji boçûnekê pêk bê, yan jî çend boçûnên serbixwe, yan jî ji boçûneke bingehîn û çend boçûnên alîkar.

Mirov dikare ji bo her yekê çend mînak bide.

Dema em bibêjin; "Bozan çû bajêr.", li vir rûdaneke serbixwe heye. Gava em dibêjin; "Bozan çû bajêr, hevalê xwe dît, li xwaringehê firavîn xwar" li vê derê sê tiştên serbixwe hene. Her wiha dema yek bibêje, "Ez darê birim, hûr bikim, bînim bavêjim argûn." li sê boçûnên têkildarî hev hene.

Di hevokê de kirpandin

Her wekî diyar e di tu zimanan de hevok birên hevokê wekî hev nayên bilêvkin, hinek peyv bişid, hinek nerm tene bilêvkin. Wekî hemû zimanan di kurdî de jî rêjay tundiya peyvê di nava hevokê de gelekî girînge. Bo nimûne di kurdî de pirs bi alîkariya kirpandinê angê derblêdanê pêk tê. Wekî din jî dema kîjan peyv bê kirpandin ew peyv girîngtir e.

Ji bo sayîkirina mijarê em dikarin he-

vokekê wekî mînak pêşkêş bikin.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Di vê hevokê de hemû peyv wekî hev nayên kirpandin, heke tiştê jî bo me girîng kîjan be kirb li ser wê ye.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê derket.

Zozan duh berî bavê xwe ji malê der-

ket.

Birên hevokê

Di hevokê de du hevokên bingehîn; kirde, pêveber û du heb jî alîkar; bireser û tîrker çar birên hevokê hene. Divê em yeko yeko li ser van rawestîn.

Kirde

Karek ji aliyê kesekî an jî tiştêkî ve tê kirin, ew kes û tişt kirde ye. Bo nimûne gava em dibêjin "Seyran çû mal.", li vê derê kesa ku wî karî dike Seyran e, lewre jî di vê hevokê de "Seyran" kirde ye.

Li ser heman mijarê çend mînakên din:

dijî wî welatî biryara şer wergire? Lê em dizanin ku dewleta terorîst li dijî hemû welatan nikare biryara şer bistîne. Bi sed hezaran kurdên dijberên dewleta tirk li welatên Ewrûpayê dixebitin. Ji bo çî Tirkîye li dijî Ewrûpiyan şer nake?

Hemû weşanên Kurdistanî li Kurdistanê qedexeyê ne. Televîzyonek bi gelek zimanan weşanê dike, li Ewrûpayê li gorî zagon û prensîbên Ewrûpayê dixebite. Ew televîzyon terorîst e? An dewleta tirk a ku bi sînyalan weşanên wê asteng dike? Baş e, ew kesên ku li wê televîzyonê temaşe dikin û xebatkaren wê terorîst in. Ma wan dewletên destûra wê televîzyonê daye û peykên xwe jê re amade kirine jî terorîst in?

Qey rojnameya Ûlkede Gündem jî terorîst e ku heya Ûlkede Gündemê sih rojnamegerên kurd hatine kuştin. Nûçeyekê heke çapemeniya Mixo bide, azad e. Lê heman nûçeyê heke Ûlkede Gündem bide, qedexeyê. Di cihanê de kê bihîstiyê ku rojnameyek li aliyekî welatî li gorî hemû astengiyên bête firotin. Lê belê li deverên din ên welatî qedexeyê be. Niha Azadiya Welat jî kete vê xekekê. Ew jî li Kurdistanê qedexeyê ye, li bajarên tirkan ne azad e, ne jî qedexeyê ye. Bêguman biryarên bi devkî ketine nivîsan. Qedexekirin û astengî her hebûn, niha bûne fermî.

Zîne kevîr avêt.

Zelalê rewşa xwe di ber çavan re derbas kir.

Rohatî çeka xwe paqij kir.

Ceng nanê xwe dide hevalan.

Kevirî cam şikand.

Êgir mal şewitand.

Kerê giha xwar.

Mar pê veda.

Pêveber

Li vê derê arîşeya navlêkirinê derdikeve pêşberî mirov. Lewre Celadet Bedirxan, ji bo fîla erebî, lêker gotiye, me jî wisa bi kar anî. Lê Celadet Bedirxan di pirtûka xwe de jî bo "yüklem"ê tu nav nedîtiye. Li ser vê yekê di hinek çavkaniyan de lêker hem wekî fîil û hem jî wekî "yüklem" hatiye bikaranîn. Mûrad Ciwan di pirtûka xwe ya ji bo fîil de kar gotiye û jî bo "yüklem"ê jî lêker gotiye. Ji bo vê yekê me jî serî li kovara Kurmancî ku ji hêla Înstîtuya Kurdî ya Parîsê ve tê weşandin, da. Di vir de her wekî Celadet Bedirxan, bo fîil lêker hatiye bikaranîn û jî bo "yüklem" a tirkî, predicate îngilizî pêveber hatiye bikaranîn. Me jî bo niha ev tîgîn girt. Divê bê gotin ku ev navlêkirin giş jî dikarin bi biryara saziyên neteweyî ya hevpar biguhezin.

Piştî vê tîbiniya pêwîst em dikarin derbasî mijarê bibin. Tiştê ku wateya hevokê dibe serî pêveber e. Pêveber, her wekî çawa dikare ji lêker tenê pêk bê, dikare çend temamkarên lêker jî bigire nava xwe.

Kî ye terorîst?

NEJDET BULDAN



Heke demokrasiya welatên rojava baş nehata nasîn, demokrasiya dewleta tirk dê wekî bihuştê bihata fêmkirin. (Li vê derê armanca me ne xêraniya welatên rojava ye.) Li Tirkîyeyê hinek bêje an jî gotin hene ku aqilê mirov radiwestînin. Li gorî wan gotinan hinek kirin, xebat û bûyer jî hene ku dîsa tîgîştina wan gelekî dijwar e.

Dayik an jî xizm û malbatên kesên ku bi destê dewletê hatine kuştin û berzekirin mafekî xwe yê ku însanî bi cih tînin. Her çalakiyekê wan dibe sedema girtin û lîxistinêkê. Û bi gotina dewletê ew jî terorîst in. Gelo ew sazûmaniya însanên xwe dike û berze dike dewlet e? An "Dayikên şemiyê" terorîst in?

Dewleta bi nijdevanî tê birêvebirin terorîst e an ne? An jî kesên ku bi destê wan nijdevan tînin kuştin terorîst in?

Li cihanê dijberî ên gelek welatan li welatêkî din xebatên xwe dikin. Ma pêwîst e ku her welatê ku dijberê wî li welatêkî din be, li

Gelek mirov û rêxistinên ku li ser çareserkirina pîrsgirêka kurdî dixebitin û çalakiyan lidar dixin, hatina wan a Tirkîyeyê qedexeyê. Siyasetmedar in, rewşenbîr in, rojnamevan in, parêzkarên mafên mirovan in û di qada navneteweyî de bi nav û deng in. Gelo sazûmankariya tirk dewlet e, yan terorîst e?

Dema kurdên Başûr li dijî dîktatoriya eraban şer dikin, navê wan eşqiyayên bakurê Iraqê bû. Rewş hate guhartin. Petrola Kuweytê bû sedema naskirina wan. Li cihanê dewletên xurt biryar da ku ew jî bibin dewlet. Bi dewleta tirk re ketine tîkiliyên qirêjî. Niha navê wan bûye "Kürdistan Demokrat Partisi" û "Kürdistan Yurtseverler Birliği". Gelo ew bûne kurd, kurdên bakurê Kurdistanê çawa ne kurd in? Û ew kurd in, yê bakurê Kurdistanê jî bo azadiya xwe şer dikin, çawa dibin terorîst? Kurdên li dijî şervanên azadiyê dixebitin welatparêz û mirovên bi qedr û qîmet in(!). Kur, keç, nevî, xwarza û birazayên wan ên şervanên azadiyê çawa dibin terorîst?

Ev pirs gelek dirêj dibin. Tecrûbeyek civakî ya welatên wekî Tirkîyeyê di jiyana me de cih girtiye. Kî di axaftina xwe de gelekî qala namûsê bike, bêguman reha bînamûsiyê li cem heye.

Hevpeyvîn bi dayik û bavê Hasan Ağaç re:

Em aştiyeke li gorî dilê xwe dixwazin

Malbata Ağaç, di serî de di nav refên PKK'ê cih girtiye û pêşketina wê bi çavê serê xwe ditiye. Lê piştî şhadeta Hasan Ağaç, malbat bêhtir kete rojeva Kurdistanian. Ji ber ku Hasan Ağaç, piştî Mehmet Ağaç û Ahmet Ağaç sêyemîn şehîdê malbatê bû û du endamên malbatê jî, ji ber doza PKK'ê di girtîgehê de ne. Malbata Ağaç, ji ber zilm û zora dewletê ji Hilwanê, ku bi ser Rihayê ve ye, koçî navçeya Edeneyê Ceyhanê kiriye. Dema em çûn serdana malbata Ağaç, li malê gelek mêvan hebûn. Bavê Hasan Ağaç İsmail Ağaç, ku gel jê re dibêje Apê İsmail, bi mêvanan re sohbet dikir. Vê keliyê, ji nişke ve sê-çar jin ketine odeyê û kirin qîre qîr. Li ser vê İsmail Ağaç bi serê lûvên xwe kenîya û gote jinan: "Şerm bikin! Ma mirov li ser van qehremanan digirî." Balkêş bû, wî mêvanên xwe serwest dikirin. Piştî bîstekê em ji bo hevpeyvînê derbasî odeyê din bûn.

Apê İsmail serpehatiya malbata we gelekî bala derdorên welatparêz dikşî-ne. Tu dikarî hinekî behs bikî?

□ Berî serê çekdarî kurê min Mehmet di nav têkoşînê bû lê di serî de haya min ji tu tiştî tunebû. Me pê zanîbû ku guherînek di Mehmet de çêbûye lê hema me kifş nedikir. Wê demê herkesî behsa şoreşgeran dikir. Hin kesên xerîb bi Mehmet re dihatin mala me. Paşê me bihîst ku ew kes, Salih Kendal, Mehmet Karasungur, Cuma Tak û Halil Çavgun bûne. Di wê navberê de me bihîst ku, kurê axayê eşîra silêmaniyan hatiye kuştin. Piştî kuştina kurê axê, heft gundên eşîra silêmaniyan bi hev re avêtin ser mala me. Bi taybetî ji bo kuştina min hatibûn, wan digot: "Kurê İsmail di nava Partiyê de ye û yê kurê axê kuştîye jî Partî ye." Ji ber vê yekê nivê şevê avêtin ser mala me. Tenê debançeyek min hebû û li hember wan, min xwe û mala xwe bi wê debançeya biçûk diparast lê bêfêde bû. Di wê navberê de, ji dût ve dengê keleşekê li ber guhê min ket. Wê çaxê min fam kir ku kurê min Mehmet û hevalê wî di gaziya min hatine. Tu nabê wê demê Hevalê Salih Kendal dibêje: "Lez bikin! Hebe tunebe ev teqîn li ser serê Bavo ye!" Wê çaxê hevalan ji min re digot Bavo. Dema dijmin dît ku wa ye heval di gaziya me de hatine, piyê wan erd negirt û hemû reviyen. Tu tişt bi me kesî nehat lê tenê tajiya min a nêçîrê hatibû kuştin. Paşê heval hatin û gotin: "Bavo! Em sond dixwin em ê heyfa tajiya te hildin." Ez dikarim bi bêjim wan sonda xwe anî cî.

Baş e. Dema ku kurên te ketin nav şerê çekdarî tu çawa lê fikirî?

□ Dema kurê min tevî Partiyê dibûn, ev tişt digotin: "Welatê min bindest e. Gerrek ez herim welatê xwe rizgar bikim." Ji


ber ku ez jî di vê baweriyê de bûm, bi min wekî hingiv şêrîn hat. Wekî din ev deynê me ye, ev wezîfeya welatparêziyê ye. Gerrek e her kes deynê xwe bide.

Dema ku digotin te kurê te şehîd ketiye, bi te çawa dihat?

□ Ev xeber piçekî bi min zor hat lê ne ji bo ku kurê min bû, ji ber ku şervanekî me jiyana xwe ji dest dabû. Ez pir diqilqilîm, ji ber vê yekê ez dibêjim hemû wekî kur û hevalê min in. Wekî din ger tu wekî bavekî ji min bipirsî, ez tenê di bêjim: Bila welat sax be!

Belê Apê İsmail zordariya dewletê li ser we gelekî heye?

□ Zordariya dewletê li ser me gelek e. Pîrî caran ji kêfî ez girt im û îşkence li min kirin. Loma guhê min



Malbata Ağaç piştî şhadeta Hasan Ağaç, kete rojeva kurdan. Ji ber ku Hasan Ağaç, sêyemîn şehîdê malbatê bû û du endamên malbatê jî, ji ber doza PKK di girtîgehê de ne.

giran bûye. Carekê ez hatim girtin. Yûzbaşi(?) lêdanek xedar li min kir û digot: "Ka kurê te Hasan bi ku de çûye?" Min got ez nizanîm. Li ser vê yekê îşkenceya li ser min berdewam kir. Wê gavê min got: "Yûzbaşi beg! Ger tu min pir biqehîrîni, ez ê bi xwe jî derkevim serê çiyê." Li hêla din qoriciya li Hilwanê, tevî hezar metre qare erese dest dane ser xaniyê min. Paşê me bar kir Wêranşehrê û ji xwe re xaniyek ava kir. Lê wê derê jî tu tam neda me û me berê xwe daye Edeneyê. Lê zordariya dewletê li vê derê jî berdewam dike. Zilm û zordarî ne xema me ye. Em natirsîn. Lê tenê ez vî tiştî dibêjim, neyartiyê jî qafdeyên wê hene. Dema tîn davêjin ser mala me, bi çavên neyarekî pir xedar li zarokên me ye ku di dergûşê de dinêrin. Gelo nizanin ew zarok wê sibê bi çavekî çawa li wan binêrin?

Tu wekî bavê sê şehîdan, ji bo gelê kurd û tirk biratiyeke çawa dixwazî?

□ Bêguman ez ji bo biratiya gelan aşti û wekhevîyê dixwazim. Heta ku doza gelê kurd neyê çareser kirin, tu kes nikare bi bêje li vî welatî aşti heye. Em nexwazin ne dayikên leşkerên tirk û ne jî dayikên gerî-

la bigirîn. Lewre em doza nasname, ziman û hebûna xwe dikin. Ji ber vê yekê em aştiyê dixwazin, ger yên li hemberî vê yekê qebûl nekin, em wekî din jî hazir in. Ez bavê 12 zarokan im. Min di vê rîya aştiyê de sê heb bedel dane. Ne xem e, lazim be ez û neviyên xwe jî em di vê rîyê de hazir in.

(Piştî İsmail Ağaç me çend pirs ji jî dayika Hasan Ağaç Eyno Ağaç kirin.)

Dayika Eyno tu dikarî behsa Mehmet Ağaç û serpehatiya wî ya têkoşînê bikî?

□ Mehmet di serî de di nava PKK'ê bû. Di sala 1979'an de li Kirwar,

Ger ez nezivîrim

Ji dayika min re bêje bila li dû min neke zarîn zar e

Mehmet li malê mirovekî çawa bû?

□ Dema Mehmetê min ji mal derdikeft digot, ez ê herim nêçîrê û sê çar mehan li mal venedigeriya. Yekcaran jî dema pir dereng bihata, digot ezê herim xerîbiyê. Dema vedigeriya malê, hereketên wî li hemberî me wekî din dibûn. Carina, hin kesên ku dirûvên wan ji me re xerîb bûn, pê re dihatin, carina jî bi pêçeka kitêbê di nîvê malê û ji xortan re dixwendin. Kurê min pir mîrxas bû û pir ji zarok û feqîran hez dikir. Wê demê min dew çêdikir, wî jî difiroto. Mehmetê min digot: "Dayê! Dew bide kesê feqîr. Li şûna wan ez ê bixebitîm û pereyan bidime te." Ji çekan pir hez dikir. Di deh saliya xwe de çeka bavê xwe li ba xwe digeland. Dema zarok bû, diçû diket nav karkeran û ew li hemberî axê hişyar dikirin. Wê hingê halê me pir xerab bû. Dema me jê re digot, were tu jî tevî me bixebite, ji me re digot: "Şoreşgerî karûbarê min e. Ev xebata ku li dû pereyan e, ne xelasi ye. Bav û kalê me emrê xwe di kar de û di koletiyê de derbas kiriye, ka çî bi dest xistin!"

Kurê te Ahmed çî çax tevî PKK'ê bû û li ku derê şehîd ket?

□ Ahmet di sala 1990'î de tevî Partiyê bû û di heştê adara 1993'yan de li gundekî ku bi navçeya Wêranşarê ve girêdayî ye tevî şer hevalê xwe di şerekî giran de şehîd dikeve. Ahmed dema biçûk digot: "Ezê heyfa kekê xwe Mehmet hilînim ji neyar!"

Berî ku Ahmed şehîd bikeve, Hasan di sala 1992'yan de tevî Partiyê bû û di sala 1997'an de li Kurdistan Başûr, li Hewlêrê tevî heft hevalên xwe şehîd ket. Hemû şehîd can û cegera min in. Ez xwe wekî dayika hemû şehîdan dihesibînim. Ez bi hemû kurên xwe şad û serbilind im.

Kurê min hemûyan alîkarî bi însanan re dikir. Hasanê min diçû li İzmîr û cihên din kar peyda dikirin û însanan me yên jar û perîşan tê de dixebitandin. Ji bo keda xwe quruşek jî nedistand. Hasan ji bo ku ji meseleyên însanan re çareyan bibîne, serê xwe diêşand. Dema çû tevî Partiyê bû, di demeke kin de bûbû Qumandarê Eyaleta GAP'ê. Ez çî bibêjim, bila çavên Barzani kor bin!

Tu li ser şer û aştiyê çî difikirî?

□ Ez aştiyê dixwazim lê li gorî dilê xwe dixwazim. Ji ber ku em dawa mafê xwe dikin. Em zêde tiştêkî nexwazim. Em nexwazin xwîn bê rijandin. Kesên ku ji kêfa xwe re xwîna mirovan dirêjînin, bila çavê wan birijê. Ji ber ku ez dayik im. Ez bi derdê kezêbê di zanim, ku çiqas zor e. Lê ez dişa dibêjim, em aştiyê dixwazin lê li gorî daxwaza xwe.

FATİH BENEDEWAR /A.WELATMÊRSÎN

Bihar e Kurdistanana min bihar e
Li hawîrdor me girtiye neyar e
Ger ez mirim dilê milyona ji bo me yar e

□ 25 kewçer 1996:


Leyla Kaplan (Rewşen) çalakiya xwefedayî pêk anî

Roja 25'ê kewçerê li Edenevê li ber deriyê Çevik Kuvvet, çalakiya xwefedayî pêk anî. Di bêverê de 3 polîs û mirovek sivil mirin. Leyla Kaplan (Rewşen) şehîd ket.

□ 29 kewçer 1996:

Güler Otaç (Bermal) çalakiya xwefedayî pêk anî

Gariyaya ARGK'ê Güler Otaç, di salvegera 73'yan a avabûna Komara Tirk de li Sêwazê çalakiya xwefedayî pêk anî. Sê polîs û mirovek sivil mirin. Güler Otaç û gerilayek din şehîd ketin.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ Kewçer 1985:

Qanatê Kurdo çû ser dilovaniya xwe

Qanatê Kurdo li bajarê Qersê hatiye dinê. Malbata wî di sala 1918'an de koçî Ermenîstanê bû. Xwendina xwe ya pêşîn û navîn li Ermenîstanê kuta kir.

Di sala 1938'an de ji bo xwendina zanîngehê çû Lenîngradê û xwendina xwe ya bilind li wir kuta dîke. Qanatê Kurdo piştî ku çû Lenîngradê bi xwendina xwe bû pisporê zimanên rojhilat. Li fakulteya ku xwend bişkiştî û profesori kir. Li ser çand û zimanê kurdî gelek behemên wî hene.

Jiyana Nû li Almanyayê

Teatra Jiyana Nû ku di bin banê Navenda Çanda Mezopotamya de xebatên xwe dimeşîne, derkete Geşta Hunerî ya Almanyayê. Jiyana Nû bi listika bi navê "Komara Dînan-Şermola" ku Helîm Yûsiv nivîsiye roja 19'ê kewçerê li Muniha Almanyayê derkete pêşberî hunerhezan.

Li gorî projeya bi navê "Kulturbrücke (Pira Çandê)" a Komeleya Zentralkulture. V. ya li Stuttgartê wê Teatra Jiyana Nû li 12 bajarên Almanyayê bi giştî 14 caran bê pêşberî temaşevanên xwe. Ev geşt ji aliyê derdorên têkildarî şano û çandê yê Almanyayê ve hate sazîkirin û wê mehekê bidome. Bi vê projeyê tê armanckirin ku derdorên navborî yê alman û Teatra Jiyana Nû bîn cem hev û bi hev re xebatên çand û hunerî pêk binin. Her wiha "Pira Çandê" di bin navê 'Em jiyane vedibêjin' de broşûrek weşandiye di vê broşûrê de dîroka NÇM'ê û a wê, xebatên wê û pest û kotekiyên dewleta tirk ên li ser hene. Li wan danasîna kom û xebatên NÇM'ê jî hatiye kirin.

Çavdêriyek li ser pêşkêşkirina yekemîn a "Şermola" li Teatr Rechts der Isar a Munîhê

'Dînan
jî dana
Xwedê
ye'



Dîmenek ji "Komara Dînan-Şermola"

Xebatkarên Teatra Jiyana Nû roja 19'ê kewçerê yekemîn car li Munîhê derkete pêşberî temaşevanên û hezkirinek gelek mezin li ba temaşevanên afirand.

Listîk bi axaftina Şermola dest pê dîke. Şermola li nêzikî bajarê Amûdê parçeyek xaka ku wekî goristan tê bikaranîn e. Ew dibêje: "Ezê neyem cem we. Hûn jî li min napirsîn... Hûn miriyên xwe datînin ser min û ji bîr dikin, lê bila hûn zanibin ku em car caran top dibin û dilan digirin. Em pêkeniyên di jiyana we de vedibêjin û em hemû bi hev re dikenin. Geh dikenin geh jî digirin."

Dûv re Selaho, Mamûn, Şerbelo û Xanimên ku civaka Kurdistan ji wan qet ne dîr e, ji bo kesên ku ji welatê xwe veqetîne, li derve di lêgerîna xaka xwe de ne, tiştên me yê ku li paş mane ango pir dîrî me ne, lê aîdî me ne pêşkêş dikin. Ew ên ku qet ji me Kurdistanîyan ne dîr bûn; "Dînan". Ew in ku hema hema li her gundî li her kolanê, em bi wan re rû bi rû dibûn.

Wan "Dînan" geh em kenandin, geh giriyan-din. Lê ji hemûyan pirtir "Wan" em dan fikirandin. Mirî û Zindî ên ku bi hêsanî nayên qebûlîkirin. Yê şerpeze... yê bîndest... yê sî-


tembar... rojekê bi rastiyê digihêjin. Û roja ku wan rastî keşîf kir, ew azad bûn. Xweşik bûn... Bûn yek. Parolaya wan "Çarçira û 22'yê Rêbendanê" bûn. 22'yê Rêbendanê û Çarçira peyvên bi sêhr bûn, ji wan re mizgîna pêserojê bûn. Wê rojê de dor bihata ser wan. Gerek e her tişt li gorî wê rojê bihata sazîkirin, diviya wê rojê bi awayekî din bihatana cem hev, bêrîkirinên ku mirov qehr dikin diviyabû wê rojê xilas bibûna. Yanî roja 22'ê Rêbendanê. Wê rojê wê dor bihata ser wan. Dor a wan bû. Ew ên ku bi sedan sal li derveyî vîna xwe bi hezaran kiras li wan hatibûn kirin. Ew ên "Mirî û Zindî" bûn.

Wê roja dîrokî roja 22'yê Rêbendanê ew, ên bi aqil û zindî ji Şermola diavêjin û avakirina "Komara Dînan" îlan dikin. Tenê ên din û ên ku ramanên wan wekî hev in karibûn di bin siya wê de bisekinin. Ew ji bo ku komara xwe ya nû bi xweşî û hevaltîyan bixemilînin, soz didin. Ew komarake gerdûnî ne tenê ya mirî û zindîyan, komara behrên û çiyayan jî ava dikin. Komara wan bêyî şer, bêyî zordarî û bêyî înkarkirin bû.

MAHMUT GERGERLÎ /A. WELAT ALMANYA

ÇAVDÊRÎ

Cegerxwîn



MIRHEM YİĞİT

Cegerxwîn yek ji wan kesên pir kêr e ku gelê kurd wî baş nas dîke û hez jê dîke. Em Kurd gîş, bi taybetî yê Bakur û Başûrê Biçûk heta tu bêjî em qerzdarê (deydar) Cegerxwîn in û di hişyariya me de rol û pişka wî mezin e.

Dema me helbestên wî dibihîstin em hê zarok bûn. Em li ser sînorê di navbera Serxet û Bînxetê de bûn. Erdên me û erdên xizmên me li Başûrê Biçûk bi tixûbên dewletên dagirker hatibûn beşîkirin. Çûn û hatina di nav her du aliyên sînor de qet tu carî ranedwestiya. Bi vê sêpla nav jor û jêr, helbestên Cegerxwîn jî derbasî aliyê me dibûn, coğrafîya wan firehtir û hezkiriyên wan jî zêdetir dibûn.

Li herêma Mêrdînê welathezek bi navê Ehmed Kurdî hebû. Demeke dirêj jî li Başûrê bBiçûk mabû û bêje hema gîş helbestên Cegerxwîn jî ber zanibûn. Ez bi riya Ehmed li ser xizmet û mezinahiya Cegerxwîn bûm xwedî fikrekê. Sal 1968 bû. Em çend kes çend rojan li Çiyayê Omeriya geriyên û di van rojan de Ehmedê ku berê jî me navê wî bihîstibû me nas kir, li Serê Kaniyê li cem mala şehîd û rehmetiyê Zibêr, em bûn guhdarê çend helbestên Cegerxwîn ku Ehmed mîna stran û qesîde gotin.

Cegerxwîn berî niha bi 14 salan di 22'yê vê mehê de li bajarê Stokholmê ku em niha van rêzan lê dinivîstin, ji nav me bar kir. Temenê wî 81 sal bû. Di helbesteke xwe de sala jî dayikbûna xwe jî wiha dide: "Sala hezar û nehsed û sê, ez hatim dinyayê. Bi navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê". Cegerxwîn kurê malbateke xezan e, wek Apê Osman Sebrî, Nûredîn Zaza yan jî Celadet ew ne kurdê dewlemend, beg an jî ji mîrekan e. Di nav xelkê de, di nav perîşantî û tunebûnê de, zîkekî tîr û çendekî birçî de mezin bûye. Bêje hema karê nekiribe nemaye; Ji şivantî û gavantiyê bigirin heta bi xebatên her cureyî, wek karkeriya li ser şîva hesin. Zarokî û xortaniya wî di nav qiralkalî û kezêbreşîyan de dibihure, dikeve ber tehn û niçan, şek û pekên jiyane. Berî balix bibe û karibe barê xwe hilgire, ewil bav û piştre jî dayika wî serê xwe datînin û Cegerxwîn sêwî dimîne.

Careke din di nav ewqas nelibariyan de çend cure zor nas dîke. Zora axa û begên kurdan û piştre zora dewletê; cendîme û tehsîldarên bêbav û bêmirwet. Destpêka helbestvanî û xwenaskirina wî heta bi salên 1924-25'an diçe. Ji vê tarîxê û bi vir de hew careke din ji xebata fikrî û neteweyî bi dîr dikive. Salên piştre dema Xoybûn çêdibe ew di nav de çihê xwe digire. Dema Hawar derdikeve milên xwe dide yê Celadet û dibe nivîskar û alîkarekî kovarê. Salên ku Evdîlkerîm Qasim li Iraqê tê ser kar û deriyekî nû ji kurdan re vedibe diçe Bexdeyê, li dora sê salan dersê dide keç û xortên kurdan. Di destpêka 1970'yî de diçe başûrê Kurdistanê. Li wir Barzanî û birêvebirên PDK'ê nas dîke û ferqa di nav dengê defa ji dîr û jî nêzik de, bi guhên xwe his dîke, bi çavên xwe dibîne.

Cegerxwîn rewşenbîrekî çepgir û li aliyê komelanên zehmetkêş bû. Di dereca yekem de wî bang dikir piraniya xelkê, kesên kedkar, rênçber, karker û xwedîrenc. Piraniya xebat û berhemên wî li ser welat, welatheziyê bûn. Ew tim li ser hewcedariya bi rêberên baş, serokên jîr û kesên berxwedêr disekin. Kes bi qasî wî jî bêtîfaqî û hevduingirtinê hêrs nedibû û ji bo ku balê bikşîne ser vê pirsgirêkê bi sedan helbest, meqale nenivîsin û heta dawîya temenê xwe ne got û ne biland. Tiştêkî din jî dubare û çendbare dikir. Berdêl û bihayê serxwebûn û azadiyê giran e. Ev jî xwîn e, zindan û sirgûn e. Bê çek û bê kotek dijîmin tu carî ji welat demakeve.

Xebatkârên Kovara JIYANA REWŞENÊ:

Em di nava âeryaya
Kurdî de noqav dibin

Di serî de me peyvên nû çêkirin. Lê peyre me dît ku zimanê kurdî ji me re zêde ye. Em carinan tê de noqav dibin. Hêmayên gelek balkêş û hêja di zargotina me de hene. Divê em gencîneya zimanê kurdî bi awayekî têtûz bidin hev. Bi vî awayî em dê zûtir bi ser bikevin. Lê divê karê zimên neyê taloqkirin.

Gelo Jiyana Rewşenê di nava du salan de hin kurd asîmîle kirin, ango zimanê kurdî kir zimanê dilê kurdan?

■ Her çend ne li gorî dilê me be jî Jiyana Rewşen hin kurd asîmîle kirin. Lê li aliyê din me hîna hevalên xwe yên li saziyê asîmîle nekirine. Di vî warî de em gelekî daxbar in. Di vî dembuhêrka şoreşê de, hemû gelê kurd di nav mercên dijwar de dijî. Lê mirov nikare van şertên giran ji bo fêrbûna ziman û çanda xwe wekî hincet nîşan bide. Bi taybetî kesên ku di warê hunerî de, di saziyên me de kar dikin, bi xemsaî û sersariya xwe me gelekî diêşînin. Lê li aliyê din ji bo ku em

doza xwe bibin serî, demêke dûvedirêj pêwîst e. Her wiha di vî serdemê de, divê em bi şeweyekî tûj rexneyan li hev girin. Ne hewce ye, em ji heft bîran avê bikişînin. Di vî avê girikî de gelek kes dixeniqin diçin. Dawiyê em dikarin bibêjin, Jiyana Rewşen ji armanca ku hatibû diyarkirin gelekî dûr e.

Li aliyê din, li ser Jiyana Rewşenê te gotin ku ji germahî û rojeva şoreşê dûr e. Hûn rexneyên bi vî rengî çawa dinirxînin?

■ Tiştê girîng ev e ku em ji şoreşê çî fêhm dikin? Şoreş ne ew e ku, em bi rêbaz û politîkayên rojane bimeşin. Şoreş bêhnfirehî û dûrbîniyê dixwaze. Ji ber

vê yekê kesên ku rexneyên bi vî rengî dikin, em ne bawer in ku, bêhnfireh û dûrbîn bin. Gelo yên ku van rexneyan li me girin, çiqas hay ji wêjeya kurdî ya devkî û nivîskî hene û her wiha çiqas hay ji berhevkarîyê hene? Dîsa der barê girîngiya werger û çîrokê de çiqas agahdar in? Çiqas teşeyên wêjeyê nas dikin?

Li aliyê din hîna kurd di serî de ne. Nemaze wêjeya kurdî di serdema destpêkê de ye. Lê tiştê girîng, pêşî divê zimanê kurdî bi ser bikeve û di nava gel de belav bibe. Hekana em bi ser nakevin. Piştî vê yekê em dikarin rojeva gel û şoreşê başbaş pêşkêşî gel bikin. Lê ev nayê wê wateyê ku Rewşen ji şoreşê dûr e. Rewşen bi serê xwe şoreşek e. Serketina

zimanê kurdî bi serê xwe şoreş e. Dema neteweyek di warê çandî û zimanî de bi pêş nekeve, dê gelek kêmasî rû bidin. Li aliyê din di şoreşa me de huner, wêjê û politîka girêdayî hev in. Lê wekî me got divê pêşî zimanê kurdî bi ser bikeve. Heya ku em di vî warî de nebin pispor, em nikarin di warê huner, wêjê û politîkayê de kovareke têr naverok derînin. Her wiha divê bê zanîn ku naveroka kovarên çandî, hunerî û wêjeyî ji yên din cuda ye. Nivîsên din di kovarên politîk û teorîk de tên weşandin. Lê ev weşan ji hev ne cuda ne, hevdu temam dikin.

Baş e. Wekî din li ser çî xwendevan kovarê rexne dikin?


■ Rexneyên ku tên bi piranî balê dikşînin ser giraniya çîrok û berhemên zargotinî û her wiha kêmbûna nivîsên cihereng. Vê dawiyê kovar wekî kovareke wergerî tê rexnekirin. Li aliyê din li ser zimanê kovarê te gotin ku; nivîs bi mantiqê tirkî tên nivîsîn û zimanê wê gelekî akademîk e, em zêde jê fêhm nakin. Her wiha kovar bêhtir wekî kovara rewşenbîran tê dîtin.

Lê rexneya sereke li ser zimanê kovarê li me tê kirin. Balkêş e ev rexne piranî bi tirkî an jî bi zimanekî din tên. Şaşiya herî mezin ev e. Divê pêşî em xwe ji vî helwestê bidin alî. Bi dîtina me zimanê Jiyana Rewşenê ne giran e. Zimanê kurdî di warê siyasî, zanistî, hunerî û medyayê de nû bi pêş dikeve. Bivê neyê dê giran bibe. Divê em ji bo fêrbûna zimên hinekî serê xwe biêşînin. Li aliyê din xwendevan bi rola xwe baş ranabin, xwe wekî temaşekar dihesibînin. Dîsa jî rexneyên xwendevanan bo me girîng in. Em hemûyan dinirxînin.

Ji bilî vê yekê rexne û daxwazên we ji xwendevanan çî ne? Bi taybetî kêmasiyên berhemên ku tên şandin çî ne?

■ Gelê me wekî mamostayan li me dinihêre. Lewre divê berê em xwe têrgihîştî bikin. Ji ber vî çendê em nikarin bi şeweyekî tûj gel rexne bikin. Me maf nîn e.

Diyar e rewşa gelê me ne baş e. Dîsa jî divê em daxbar û xemgîn nebin. Bi têra me nekin jî hin hewl hene. Ji ber vê yekê



NASNAME:

■ Kovarê Jiyana Rewşenê berî niha bi du salan li meha kewçêrê ji 'pênûs' bû. Ew du sal in piştî xwe daye felekê, berê xwe daye oxirê dimeşe. Gelek caran xebatkârên kovarê şevê li xwe dikin sibe ango li ser kursiyên radikevin. Ji ber ku bi roj derfetên xebatê zêde peyda nabin. Xebatkârên kovarê ligel karê kovarê bi karên din jî dadikevin û lewre nikarin li karê xwe zêde germ bibin. Her wiha xebatkârên kovarê di warê peydakirina kadroyan de tengasiyê dikişînin û giliyên xwe ji kurdên welatparêz dikin. Jiyana Rewşenê di serî de 3-4 hezar dihatiye çapkirin. Lê vî dawiyê ev hejmar daketiye 2 hezaran. Kovar, piranî li Stenbol, Edene, Mêrsîn, Îzmîr û li hin deverên Kurdistanê tê belavkirin. He ta niha bes li dijî hejmara 10. ya kovarê doz hatiye vekirin. Vê dawiyê Jiyana Rewşenê li Mihrîcana Govendê ya Kurdî, ku li Kolnê saz bûbû, ji ber xizmeta xwe ya bo çanda kurdî, xelat wergirt.

Hîna kurd di serî de ne. Nemaze wêjeya kurdî di serdema destpêkê de ye. Lê tiştê girîng pêşî divê zimanê kurdî bi ser bikeve û di nava gel de belav bibe.

Hekena em bi ser nakevin. Piştî vê yekê em dikarin rojeva gel û şoreşê başbaş pêşkêşî gel bikin. Lê ev ne wê watayê ku Rewşen jî şoreşê dût e.

kesên ku bi karê çandî û zimanî radibin, divê gelekî li karê xwe bixebitin û serê xwe bişênin. Lewre yê bi vî karî radibin bi serê xwe "Don Kîşot" in. Lê berî her tiştî me sîstema perwerdehiyê divê.

Berhemên ku tîn şandin berî her tiştî jî aliyê metodolojîyê ve qels û lawaz in. Yê ku dest bi helbestnivîsînê dikan, divê hay ji wêjeya klasîk ya kurdî, zarîgî, wêjeya nûjen ya kurdî û wêjeya cîhanê hebin. Ne tenê di warê helbestnivîsînê de di hemû waran de kêmasiyên mezin rû dî.

Wekî me got rewşa gel karesat e. Tu dibê qey gel hiş û dilê xwe winda kiriye. Assîmîlasyonê tesîreke mezin li gel kiriye. Divê bê zanîn, yê ku zimanê xwe yê zîmkakî jî dest didin, kesayetîya xwe jî ji dest didin. Li layê din kurd zimanê xwe biçûk dibînin û pê re jî xwe biçûk dibînin. Malbatên kurd, yê welatparêz jî, pêwîst nabînin ku bi zarokên xwe re bi kurdî biaxivin. Pêşî divê malbat li zimanê xwe xwedî derkevin. Yê ku zimanê xwe ji dest didin, rûmeta xwe jî ji dest didin.

Li ser xebata kurdewarî dîtinên xweşbîn û reşbîn hene. Hûn xwe çawa dihesibînin? Hûn Don Kîşot in ango avê dikolin?

■ Em Don Kîşot in lê ev nayê wê watayê ku ev ziman û çandî geş û xurt nabe. Wekî din rê û çare nîn e. Divê em bi ser bi kevî û em dê bi ser kevî jî. Em di serdema zarokatiyê de ne. Me dil heyê em bîngeheke baş deynin.

Rast e. Em avê dikolin. Tiştê dijwartinî çî ye, em vî dikan. Lê balkêş e, em kurd nexweşîya xwe baş destnîşan dikan, lê em ji bo dermankirina nexweşiyê tê nekoşin. Wekî din em lê naxebitin ku em literatûra xwe bi kurdî biafirînin. Şoreşa Kurdistanê bi destê rewşenbîran pêk nehat. Şoreşê bi destê rewşenbîran girt. Lê êdî divê rewşenbîr jî xewa tiralîyê hişyar bibin. Divê kovar, rojname, hunermend û hwd. bi rola xwe baş rabin. Li me dereng e. Lewre me şoreşa çandî û civakî jî divê.

Wekî diyar e giraniya rexneyan li ser zîmên e. Gelo stratejiya Rewşenê ya li


ser zîmên çî ye?

■ Ev pirs ango standartbûna zimanê kurdî, di nava nivîskarên de pîrseke dijwar e. Jiyana Rewşen ne xwedan stratejiyeyeke tîkûz û sazîyar e. Ji ber ku di vî warî de kesên tîr zana, ku pêşengiya me bikin, nîn in. Li ser vê pîrsê em dikarin vî bibêjin: Pêşî me dil heyê, em soranî û kurmançî ber bi hev bînin. Ev jî demeke dûvedirêj dixwaze. Ji bo vê yekê divê nivîskarê kurd xwe bi zaravayekî bi sînorkirinê û berê xwe bidin zaravayên din. An na wê kêmasî û şaşiyên mezin rû bidin.

Wekî xuya ye, di kovarê de bi giranî nivîsên bi kurmançî tîne weşandin. Lê dema bi zaravayên din nivîsên bînin û hejayî weşandinê bin, em diwêşînin. Ji bo me peyv bi soranî ye ango bi kirdkî û kurmançî ye, ne girîng e. Bi dîtina me zara-va hevdu xurt û geş dikan.

Lê dema em li Rewşenê dînîhêrin, berê nivîsên bi kirdkî û soranî zêdetir bûn. Ev rewş, jî we an jî jî sersariya nivîskarên digewime?

■ Bi taybetî di serî de ligel nivîskarê ji başûrê Kurdistanê tîkiliya me baş bû. Li piştê gelek jî wan çûne Ewropayê lewre tîkiliya me qut bû. Di vî warî de sersariya me jî heyê. Em bi pey van nivîskarên nakevin, da



Gelo hûn li kadroyan digerin ango hûn li hêviya kadroyan in?


■ Navnîşana me diyar e. Cih û warê me her kes pê dizane. Dema mirov dilxwaz be, ku ker û lal be jî, dikare di nava xebata Jiyana Rewşenê de di demeke kin de li karê çandî û zimanî germ bibe.

Têkilî û hevkeriya Jiyana Rewşenê digel beşên NÇM'ê yê din çawa ye? Divê li ser muzîk, şano û wêjeyê nivîsên têrnaverok derkevin. Çima dernakevin?

■ Dê rewşeke bi vî rengî rû bide: Ger her tiştê bi kurdî Rewşen bike, dê beşên din çî bikin? Beşên din diyar e wisa difikirin: Kar û barên zîmên karê Jiyana Rewşenê ye. Karê zîmên ne xema wan e.

Li gelek derdoran fêrbûna zimanê kurdî wekî hobiyeke tê dîtin. Gelo ev helwest li ser xebatkarên NÇM'yê jî peyda ye?

■ Peyva hobi zêde lê nayê. Lê divê mirov dilxwaz be. Nexwe wekî hobi tê dîtin an jî bi ser nakevin. Ev jî bo hemû warên huner û wêjeyê wisa ye. Hevalên me jî piranî ne dilxwaz in. Wekî minak, hevalên me yê muzîkjen dema derdikevin ser sehneyê, nikarin du sê hevokan saz bikin. Divê em bi hev re kar bikin û bi ser bikevin. Li a-



Xebatkarên Jiyana Rewşenê rexneyên li ser zimanê kovarê di cih de nabînin û daxwaz dikan xwendevan xwe wekî temaşekar nehesibînin. Bi bawerîya wan, zîmânê kurdî di warê siyasî, zanistî, hunerî û medyayê de nû bi pêş dikeve. Bivê nevē dê di destpêkê de bi gel giran were. Divê kurd jî bo fêrbûna zîmên hinekî serê xwe bişênin.

ku em nivîsên bi vî rengî peyda bikin. Li aliyê din nivîsên giranbiha jî zêde nehatin ber destê me.

Ji bilî problemên li ser naverok û zîmên, çî li ber we dibe asteng?

■ Bi bawerîya me problema me ya herî mezin kêmbûna kadroyên tîrzana û şareza ye. Di warê redaksiyon û tashîhê de kêmasiyên me hene. Li ser vî pîrsê, divê mirov behsa sersariya kurdan jî bike. Îro bi milyonan ciwanên kurd doza welatparîziyê dikan. Lê Jiyana Rewşen di peydakirina kadroyan de zehmetiyê dikîşîne. Ev yek mirov şaş û metel dihêle.

liyê din gelek heval jî vî rewşê aciz in û dil dikan ku fêrî kurdî bibin. Dema bi gel re rûdinin, xeman dixwin û jî bo ku bi kurdî biaxivin zorê didine xwe.

Jiyana Rewşen her çiqas wekî kovareke çandî, hunerî û wêjeyî tê nasîn jî, nivîsên li ser dîrok û fîzîkê jî tîne weşandin. Ev jî bégavîyê ye an amatoriyê ye?

■ Em di warê nivîsên têrnaverok ên çandî û wêjeyî de tengasiyê dikîşîn. Lewre em nivîsên bi vî rengî diwêşînin. Ji ber vî yekê em dikarin bibêjin kovara me mîsyona xwe başbaş bi cih neaniye.

Ji bo pêşerojê bi her awayî li ber destê

we proyeyên çawa hene?

■ Ji danîna nûnergehane bigire heya guherandina naveroka kovarê proyeyên me hene. Ya herî girîng xurtkirina naveroka kovarê ye. Projeyên din jî bi vî yekê ve girêdayî ne. Me dil heyê li ser zîmên kadroyan pişpor bigihînin. Ev jî bo nûnergehane jî pêwîst e. Niha tenê li İzmirê nûnerê me heyê. Lê em dil dikan li Amedê nûnergeha xwe deynin. Heta em dixwazin navenda kovarê bibin Amedê. Her wiha me divê, ji nav xebatkarên NÇM kadroyeke nivîskarên pêk bînin.

Li aliyê din me dil heyê, li ser navê A-li Temel pêşbaziya helbestan li dar bi xîn. Divê ew di demeke kurt de bê pêkanî. Her wiha divê kovar bi serê xwe bibe sazî û cihê wê bê guhertin. Ji ber ku bi vî awayî mirov dikare berhemên heja û xurtir derîne holê.

Dîsa di warê zîmên de divê em rapêrnekê pêk bînin. Divê em bidin zanîn ku, zîmânê kurdî tîr her tiştî dike. Ji ber ku me di jiyana xwe de ev yek selmandiye.

Lê hin kes dibêjin bi zîmânê kurdî lêkolînen zanistî nayên kirin. Bes zîmânê zarogî û stranên e.

■ Van kesan hay ji zengîniya zîmânê kurdî nîn e. Di destpêkê de ji ber nezaniyê, me peyvên nû çêkirin. Lê peyre em pê hesiyên ku zarogîna kurdî tîra me dike. Lê divê em bi awayekî zanistî û hûrbînî berhevkarîyê bikin. Divê em bibin nêçîrvanê peyv, biwêj û çîrokên.

Em bi nivîskarên kurd bêhtir, bi kal û pîrên kurd, zana û agahdar dibîn. Ji ber ku li ser nivîskarên kurd hişmendiya zîmânê biyanî peyda ye. Bi kurtaî em dikarin bibêjin zîmânê Kurdî ji me re zêde ye. Em di nava deryaya kurdî de noqav dibin. Hêmayên gelek balkêş û heja di zarogîna me de hene. Divê bê zanîn, her kes diçe ber dangê xwe. Li hin kesan dereng e. Bila kes xwe nexapîne. Zîmânêkî din li me nake. Divê em gencîneya zîmânê kurdî bi awayekî baş bidin hev. Bi vî awayî em dê bi hêsanî û zûtir bi ser bikevin. Hekena karê me dê dijwar bibe. Divê karê zîmên neyê taloqkirin.

Di nav rûpelên Rewşenê de nivîskarên navdar cih digirtin, lê Jiyana Rewşen bêhtir cih dide nivîskarên ciwan. Ev tercîh e yan na?

■ Wekî me li jorê jî da xuyakirin, me dil heyê ku kadroyên têrgihîştî perwerde bikin. Her wiha em nexwazin girêdayî nivîskarên derve bibin. Lewre em giraniyê didin kadroyên ciwan. Lê divê neyê ji bîr-
kirin, Rewşen bi Kurdî û Tirkî derdîçû, lê Jiyana Rewşen xwerû bi Kurdî derdikave.

Wekî diyar e her li ser NÇM'ê êrîş li dar in. Ev êrîş çî tesîrê li xebatên we dikin?

■ Tesîreke mezin li me dike. Gelek çaran em ji bilî karûbarê xwe, bi gelek karan dadikevin. Lewre em nikarin bi şeweyekî başbaş li karê xwe hûr û germ bibin.

Çîroka gerîlayên ku zivstanê 28 rojan meşiyane

Û me mirin dereng hişt

Şîrê dayika min zuha bûye
Ji dêvla şîr de xwînê dimijim
Ararat ji min re bûye dayik
Di devê me de tama tîrş a mirinê
Li her derê belav bûye, tenê di şivîlê
de xwîn
Dewsa lingên bi xwîn heye, ber bi
sor xemiliye

Çemekî zirav û bi fetlînok bi bir tîne
bi vî halê xwe.
Xwezaya hov êrîşî me dike
Tîrs hesteke ji birkirî bû hêkû
Lê tîrs dîsa zindî dibe
Di devê me bi tameke tîrş
Bê dîsa ew melodî
digot

Bêçošiyê, mîna gu-
leyekî giran xwe berda
ser sermayê

Bes e êdî bes e
Bi her tiştî re berx-
wedan divê û ma em
nabêjin şer dijwar e?

Ku bi rûmetî keti-
na dîlanê

Li lûtkeya Araratê
Li firkevan hevdi-
tin hebe

Û ku hebe daxwa-
za rizgarkirina dilan
Naxêr! Na ha! Li
nîvê rê nemîne

Evîna me bi qasî
mezînbûna Ararat e

Ew evîn ku
Mîna tîreja rojê
dibirîqe

Wextê em bi e-
vînê barkirî dime-
şin cem te

Dil radibe şa-
hiyê, dil hildi-
avêjê, dil xwîn di-
gire

û hîna em li ne-
walê.

Sekinîm. Mîn li te temaşê kir.
Darên rût ên pêşî li rûlên min dike-
vin

Li aliyekî dengê çeqel, dengê guran

Li aliyê din jî kundê bêxêr dixwîne
Wê aşîr bikeve...

An na wê jî xwe re êrîş bikin? (!)
Xityare şîrove dikim xwendina kun-
dan

"Qasîdê mirinê ne" digot berê

Waye keriyekî çeqelan
Hindik maye ez bigiheme wan
Ez gihîştim digêhijim wan
Ew gihîştin digêhijin min.
Waye dibe wiza wiza guleyan

Li ber serê min.
Tê bîra min, bi zarokatî me dilîst
Lîstikên şer
Wê demê em qestî dihatin kuştin
Bi derewînî ku em dimirin
û di gorê de dihatin veşartin...
Niha ne derewînî guleyan gewdê
min qul kir û buhûrî
Binêre! Xwîna min çawa berfê dihe-
lîne
Hîna sar nebûye xwîna min
Dilê min hîna germ e
Hêviya Reşo ye, ferhenga nepenî
Ji ber wê dilê min bi hêviyê
Lê hîna. Nenêre li vezilandina min î
ser erdê

riya min
Wan tîknebir tohildana min
Nişikand vîna min
Cesareta min...Hêza wan qediya
Mîna komek hestî kire qirçe qirça
gewdê wan...
Em ji êgir hîn bûn, bi namlûyê re
girtina dîlanê
Lewma namlû bûne pereng, dil ra-
bûn raperînê...
(Em li Bulbula ne)
Em bi hişîniya rojê hatin şûştin
Bi germahiya rojê hatin cem te
Dilê me yî deryayî ji te re ma.
Sadiq, paqij û xwerû
Me tu kirî nas ji jiyana xwe re
Lê tu bi her tiştî xwe diket

û mirina xweşik xwe ji konçala ni-
şan dide.
Tu yê bi bêjî : Ma mirina xweşik he-
ye?
Belê heye mirina xweşiktir
Hem ew mirin e ku bedela jiyane ye
Hem ew mirin e ku Öcalan'an diafi-
rîne
ji bo sibê û em bi vekirina riyekê
Pêş ve diçin her ber bi Araratê
Bîst û sê roj
Me bîst û sê rojan mirin jî dereng
hişt
Ma mirin jî dereng tê hiştin Ararat!
Me ev kir
Dema di newalê de dengê me li hev

Dema qirînê
me tevî Arasê di-
bûn

Me her kêlî mi-
rin jî dereng dihişt
Bêhna çermê me
yî şewitî. tevî bêhna
barûdê dibû.

Hey Bulbulan tu
yê bi bêjî:

Ma ji bilî vê tişteke
heye

Vaye dîsa. ev mi-
rina çavreş li hem-
berî min disekine
(Gewdê cemirîne,
xwîn nahekiye)

Ha wê rojê, em gi-
hiştin Araratê heya
bêdawîbûnê

Bi hemû bêriyên
xwe ve, bi hêviyên
xwe ve

û bi xeyalên xwe yî
ku me guhastine pêş-
rojê

...Bûbû nîvê
şevê...Perengê êgir te-
miribûn

Roniya kûr bi lertzokî
vêdiket

Tê fêmkirin ku gaz nemaye di lem-
bayê de

û kalo hîna berdewamî axaftina xwe
berdewam dike

"tiştên bîn gotin hîna pir in..."

Awirên wî tûj;

Wan bi beşîşandin û bi nêrinên tûj
bawerî

roj silav dikir li lûtkeya Araratê.

(Qediya)

GIRTÎGEHA BARTINÊ

** Li ser bîranîna 72 karwanên pîroz
ku di zivistana 94'an de 28 rojan meşî-
yane)



Bêjin Reşo wê ji te re "Hêviyê vejî-
ne" bêjin

Oyy Dayika çiyayê Ararat!..
Ma tu nabînî gewdê min î bela wela
gewdê minî cemîrî, hişîn û reş bûyî
Qayîş li îxanetê
Kulmên min î şidahî ku berbi ezman
bilind bûne...

Binêre; Her beşek ji min li aliyekî
Zurbên çeqelan belavkirin gewdê
min
Tiliyên min î ku lûla çekê girtine

Piyê minî ku ax dihejand, sînga min
a ku li hemberî tofanê disekinî
û bedena min lê belav nekirin bawe-

bêdeng î
Ararat.

Vaye Zinarên te, axa te
Lûtkeya te ku mirov nagihêjîyê
Bila hîn jî bilind bibe.

Bi rawestana me yî bi berxwedanî li
dijî mirinê

Tu dibînî!..."Awayê mirinê zêde di-
bin li van deran"

Bêdengiya mirinê, xinizîya mirinê
Ji paş ve bi ser me de tê.

Mirin pevçûnek e, mirinek e
Sermayek an jî birçîbûnek e
Her rengê mirinê
rûçikê qirêjê mirinê

Lî Mêrsînê

● 24.10.1998 şemf: Koma Hemdem, Pêşkêşkirina helbestan û Koma Dîlana Şoreşê 'Lîstika Qertel' Cih: Hadep, saet:14.00

Lî HADEP'a Esenler

● 24.10.1998 şemf: Konsera Koma Rojhilat, saet:15.00

Lî Navenda Çanda Tohumê

● 25.10.1998 yekşem:

Konsera Ozan Mervan û Dîlana Koma Serhildanî, saet:13.00



Lî Navenda Çanda Mezopotamya ya İzmirê

● 24.10.1998 şemf:

Konsera Hozan Dîşiyar (NÇM-Amed), saet:18.00

● 25.10.1998 yekşem:

Konsera Hozan Dîşiyar (NÇM-Amed), saet:17.00

● 30.10.1998 în:

Semîner: "Şer û Aştî", Beşdar: Temel Demirer

Bang

Ev demeke dirêj e ku Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê di kar û barê çandî de têdikoşe. Bi taybetî zargotin û berhemên kevneşopî yên kurdan ku nehatine nivîsandin, hewl dide ku gişan binivîse. Wekî em giş dizanin wêje ya kurdî ya devkî, pir dewlemend e. Jê beşeke girîng jî stranên dengbêjan û dengbêj bi xwe ne. Di bin sîwana înstîtuyê de lijnaya zargotinê hewl dide ku jiyan û beremên dengbêjan berhev bike û di "Antolojiya Dengbêjan" de kom bike. Lê belê ji ber firehbûn û kûrbûna vê mijarê û bêderfetiya gihastina ba dengbêjan em alîkariyê ji we xwendevan û dengbêjan dixwazin. Ji bo vê xebatê heke van pirsên li jêr dengbêj bi xwe bibersivînin an xwendevan, artasteyî dengbêjan bikin û bi riya faksê an nameyan bigihînin me, wê pir baş bibe û berhemeke hêja derkeve holê.



Pirsên me ji bo dengbêjan:


1. Navê we çi ye?
2. Navê bavê we çi ye?
3. Navê diya we çi ye?
4. Hûn bi navê xwe an navekî din tên nasîn?
5. Jin an mêr?
6. Hûn di kîjan salê de hatine dinê?
(Heke ne diyar be li kîjan bûyerên xwezayî an civakî rast tê?)
7. Çend zarokên we hene?
8. Hûn bi çi debara xwe dikin?
9. Hûn koçber bûne an na? (Heke hûn koçber bûbin, aniha hûn li ku ne?)
10. We di çend saliya xwe de dest bi dengbêjiyê kirîye?
11. Hûn ji kê hûn bûne? (Ji ber xwe an ji hinekan)
12. Ji malbata we kesekî din dengbêj heye?
13. Hûn stranên ku we çêkirine dibêjin an yêr hinek dengbêjên din dibêjin?
14. Çend stranên ku we ji ber xwe çêkirine hene û navê wan çi ne?
15. Hûn di bin bandora tu dengbêjan de mane, navê wî/wê çi ye?
16. Heta niha we kaset, CD, plak dagirtine? We dagirtibin çend heb hatine firotin?
17. Hûn ji kîjan stranên xwe hez dikin?
18. Hûn ji kîjan dengbêjî hez dikin an dicibînin?
19. Hûn kîjan stranên ku dengbêj dibêjin hez dikin?
20. Stranên we yêr herî navdar kîjan in?
21. Ji van stranên we yêr navdar tu dengbêjên din jî dibêjin an na?
22. Stranên we bi kîjan teşeyêne yêr (serhewa, yêr dawetan, qesîde û hwd.)
23. Hûn tu amûrên muzîkê bi kar tînin an na?
(Tembûr, riba, erbane)
24. Pêkûtiya dewletê li we bûye an na? Heke bûbe we çi xisar ditiye.
(Cezakirin, binçavkirin, koçberkirin û hwd.)
25. Hûn bi giranî bi devoka kîjan herêmê dibêjin û bi kîjan zaravayî?
Têbînî:
- Hûn karibin ji me re çend stranên xwe binivîsînin an kasetên xwe bişînin.
- Hûn dikarin pirsên ku me nepirsîbin jî binivîsînin û van pirsên me bi berfirehî bibersivînin.
- Dergbêjên ku çûbin ser dilovaniya xwe, lêzimên wan jî dikarin van pirsan bi qasî ku zanibin bibersivînin û kasetên dengbêjî ji me re bişînin.
- Her mirovê kurdî bîrbir dikare van pirsana arasteyî dengbêjên derdora xwe bike û ji me re bişîne.
Ji bo alîkariya we spas.

Navnîşan:

Çiya Mazi-Hasan Kaya
Atatürk Bulvarı. Ceylan Palas Ap.
No: 154/12 Aksaray/ İstanbul
Tel: 0 (212) 527 19 11
Fax: 0 (212) 527 61 49

TÎŞK

Ew dîw perdey qeyran



BEKİR ŞIVANÎ

Qeyranî berpakiraw le nêwan Turkiye û Sûriye da berdewam e. Lêpirsiwaranî payebilindî dewletî turk be serbazî û sivîlew, rojane hereşe û qûreşe be ser Sûriye de barênin. Tenanent hereşekanî Demirel Sûriyeşî têperand û qûtî ew hemû cihan wişiyar dekatewe. Ewey le lay Sûriye û cihanî erebewe cêy ser-sûrman e ewe ye ke boçî Turkiye lenakaw em qeyraney berpa kird û bê hiç pêşekiyek doxekey geyandote xalî teqînewe!

Siyasetmedaran û nûseran le dezgakanî rageyandin da be rîz kirdinî zincîreyek ho pasawî têkçûnî kutupirî peywendî nêwan Sûriye û Turkiye dedenewe ke hiçîyan le dayik bûy diwa an û sat nîn, belkû be dirêjayî temenî 75 salay komarî Turkiye beşî zorî ew hoyane le arada bûne û hiç kat Turkiye wekû emro gewrey nêkirdûnetewe û neykirdun be amrazî hereşey bekar hênanî hêzî serbazî le dijî Sûriye. Hoyekî serekî em nakokiye meseley lîway Îskenderûn e. Fransa katî xoy wîstî be bexşîni ew herême be Turkiye, tirkekan bédeng bikat. Sûriye le nexşekanî dewleta da Îskenderûn wekû parçeyekî dizrawî welat nîşan dedat û Turkiyêş dawa le Sûriye dakat ew meseleye le bîr bikat. Ber le rûxandinî komarekanî Sovêtî pêşû, Sûriye girîngtirîn hawpeymanî Mosko bû le herêmeke û hawzeman Turkiyêş parêzerî sinûrekanî NATO bû. Enqere hemîşe û ta êştay Şam bewe tawanbar dekat ke amêzî bo hêze çepekanî dij bem kirdiwetewe. Meseley narazîbûnî Sûriye be hawpeymanî nêwan Turkiye û Îsraîl û nîgeran bûnî Turkiye bewey ke Sûriye pêşengî welatanî Erebe û Îslamî dij bew hawpeymanîye ye, lay xwêneran rûn û aşkira ye. Hoyekî tirî em qeyrane helbet le goşenîgay Turkiyewe piştgirîkirdinî Sûriye ye le Partî Kirêkanî Kurdistan PKK. Her çende ereb le girîngî em xale kem dekenewe, belam pêwîst e bizanrê hoy serekî alozî Rojhelatî Nawerast kêşey kurd e û heta çareserêk bo em kêşeye nedozrêtewe, herêmeke aştî û aramî bexowe nabîne.

Enqere hoyekanî şerî 14 saley 20 milyon kurd nabîne û heman lojîkî hamnitq kon dúbare dekatewe û kêşekanî nawxo bo derewe denêrê. Mawey 15 sale Enqere, Şam be piştgirîkirdinî le PKK tawanbar dekat, belam hiç katê Turkiye wekû em rojane helwêstêkî ewende dujmikarane nîşan nedawe.

Helbet komelê ho hen ke paliyan be Turkiyewe na lem katê da kêşeke biteqênêtewe. Bestinî konferansî nêwneteweyî taybet be Peymanî Lozan, rageyandinî agirbest le layen PKK we, danîştinekanî Perlemanî Ewrûpa lemer kêşey kurd, rêkewtinî aştî Washington û diwa kobûnewey Perlemanî Ewrûpa lemer kêşey kurd, rêkewtinî aştî Washington û diwa kobûnewey Perlemanî Kurdistan le Derewey Welat (PKDW), palî be Enqerewe na perde bipoşê be ser pêşketwî û serkewtinekanî dîplomasî kurd da. Lêrewê derdekewe ke mebest le hereşekanî Turkiye le Sûriye û tawanbarkirdinî be yarmetîdanî PKK, le heman kat da bo serqalkirdinî cihan e be kêşeyekî tirewe û bo kêşanewey berey jêr pêy layenî kurdî ye le platforme nêwdewletiyekan. Belam layenî kurdî hemîşe pê le ser têkoşan dade-girê û lew bawere da ye ke ta çareserêkî yekcarekî û rewê bo kêşey kurd nedozrêtewe, mehale şiney bay aştî û asayîş le Rojhelatî Nawerast helbikat.

Hesenê Musa û Hedoka Qaso

Hesen heyra qurba karwan bar kir çû Mêrdînê

*Bila Xwedê xirab bike mala Simkê Qaso û Derwêşê Cafo ket kemînê
Dedreb ji aliyê xaroka xopan li me di teqîne
Dîna min dît Hesenê Mûsa geriya li nava gola xwînê
Yadê yabo destê min heta qirpikê, ber bazina kete devê vê birînê
Heyf û mixabina Hesenê Mûsa, kesek tune ku ji bo wî bike şînê
Ezê rabim porê xwe kur bikim, delîl li halê min rebenê har û dinê
Hesen di nav destê Hedo de wekî mirîşka ku tu ser jê bikî diperpîte.*

Hedo, çi kincê ku bi bejna xwe da kiribû hemû dike tîş û li birîna Hesen girê dide.

Dike dike nake xwîna birîna Hesen naçike. Dike hawar û qîrîn û dibêje:

*Hesen heyra qurba ez bibûma teyrek ji wan teyrên bejî
Min xwe daniya ser wî guleyê darê ser wî hejî
Xwedê bikira miradê miradxwazan miradê min û te jî
Ji birînen xelq û alemê dihat nê û e-lem
Ji birîna Hesenê mala Mûsa tim tê xwîn û mêjî*

Qewet û mefera Hesen nemaye ku biaxive. Ji ber birîna xwe ya xedar ji kûr de dinale. Hedo serê Hesen li ser çonga xwe datîne û deng lê dike:

*Hesen heyra qurba bihar hat bihara rengî
Îro kaxizek ji Biloka xopan hat, xarokê bûye dengî
Digotin mala we xirab e ma ne Hesenê Mûsa û Hedoka Qaso bûne bengî
Hesen heyra bila Xwedê miradê min û te kiriba
Heger miradê min û te nebuwa jî, min mêr nedikir heta kengî
Ez ê bihatama daweta te xortî, te lewendî û te lehengî
Hesen heyra îro sehra sibê kewan li me pir dixwendî
Ez ê rabim reşa xwe girêdim li ser destmala qehwerengî*

Hedo, hêstirên xwe bi desmala serê Hesen paqij dike. Belê êdî Hesen nema dikare binale jî. Qederekê dimîne dibe

êvar. Roj li ber ava ye. Te digot qey Hesen li benda rojê bû. Roj hêdî hêdî qulibî pişt Çiyayê Qaroka xopan û nema derket. Serê Hesen jî ji ser çonga Hedo dikeve xwarê û çavên wî yên reş û belek diçin ava. Hedo ax û kevîrên Çiyayê Biloka hemû bi ser serê xwe de dikeve û li ber serê Hesen rûdine. Dibêje û dibilîne:

*Heywax li min heywax li min mala minê
Heyfa çavên reş û belek îro ax ketinê
Hesen heyra qurba bila mêr heram be li vê dinê
Di ser te re dilan nagrim bi xwe ez heta mirinê
Ma ne min û te bi hev re dabû soz û qerarê mêr û jinê
Bav û bira li me bûn dijmin, me çav berda revandinê*

Hedo wekî peza gêjû, vir de wir de digere. Dîn û har bûye, nema dizane dê bi ku ve here. Destê xwe dide ber rûyê xwe û disihire. Dinêre ku wa ye reşek ji dûr ve tê û dikeve û radibe. Hedo ji xwe re dibêje "Heye tune ye ev ê ku vê tariyê daye riya çiyê, Apê Mûsa ye. (Bavê Hesen)

Hedo bang dike dibêje: "Apo xêr e? Tu li van deran li çi digeri? Çi te wenda bûye ku tu bi vî halê xwe ketiyî serê riyân?" Apê Mûsa dibêje: "Keça min, beranekî min winda bûye. Îro sê şev û sê rojên wî ne ku nehatiye mal. Ez li beranê xwe digirim. Ma te beranê min nedîtiye? Hedo bersiva Apê Mûsa bi vî awayî dide:

*Here Apo îşev şev e şev tarî ye
Ez dizanim dilê te bi kul e pir xwînî ye
Tu pîrsa beranê xwe dikî û dibêjî "Ka li ku ye?"
Ez beranê te nas dikim yekî sor e pez kovî ye
Belê devê min bişkê çavê min birîje xelqê beranê te kuştîye
Heger ku tu dibêjî ka beranê min li ku ye
Ezê bêjim beranê te va li vir e, bê xwedan û bêxwedî ye*

Gava ku Hedo wilo dibêje, Apê Mûsa diçe xwe bi ser cenazeyê Hesen de davêje û ji ser hişê xwe diçe. Gava ku bi ser hişê xwe ve tê Hedo dibêje:

*Apê Mûsa bejna min zirav e şilla qetê
Bila şîn nehata li Biloka xopan li pere xetê
Ezê rabim xwe girêdim herim Diyarbekira şewitî wilayetê
Ezê herim devê deriyê wî reisê hikimetê
Ezê bêjim qebûl bike rica min qozaxê min hurmetê
Îro sê rojê cenazê Hesenê Mala Mûsa maye li rastê li ber heybetê
Hey wax li min hey wax li min mala minê
Heyfa çavên reş û belek îro ax ketinê*

Piştî sê şev û sê rojan cenazeyê Hesen vedişêrin, roja îda qurbanê ye. Hedo diçe di nava refên qîz û bûkan de rûdine û dibêje:


*Hesen heyra qurba îda me fitilî hate îda vê qurbanê
Qîz û bûkên gundê me daketin ber govendên vê dilanê
Xortên gundê me daketin ber kevîrê vê nişanê
Dêhn û bala xwe didimê Hesenê Mala Mûsa nexuyaye li meydanê
Tivinga Hesenê Mûsa bêxwedî maye li singê vê eywanê
Hesen heyra rabe ji bo xatirê min rebenê min wêranê
Hey wax li min, hey wax li min, mala minê
Heyfa çavên reş û belek îro ax ketinê
Hesen heyra bila li min heram be zewaca mêr û jinê
Piştî çavên te yê reş û belek li vê dinê
Bila Xwedê rokê berî rokê bistîne rihê min Hedoka Qaso emir kinê.
(Qediya)*



Jiyana Rewşen du sal li pey xwe hiştin

Kovara Çand û Hunerî ya NÇM'ê Jiyana Rewşen bi hejmara xwe ya 24'an derket pêşberî xwendevanên wêjeya kurdî. Di kovarê de li ser girîngiya ziman û wêjeya kurdî sergotinek hatiye darijtin. Ev gotar bi zimanekî razber û rexneyî hatiye nivîsandin.

Her wekî hejmarên din, di vê hejmarê de jî F. Husayn Sağniç şexsiyeteke namidar; Şêx Mehmedê Kerbelayî digel jînenîgariya wî çend nimûne ji dîwana wî bi me dide nasîn. Di nava rûpelên kovarê de hevpeyvîneke digel Keremê Seyad cih digire. Keremê Seyad di vê hevpeyvîne de li ser mêtûya kurdên Sovyetê û Radyoya Erîvanê serpehatî û serboriyên xwe derpeş dike. Kawa Nemir di vê hejmarê de li ser Mythos û Mythologiyê nivîseke lêkolînî nivîsiye. Di nivîsê de piştî ku wateya mythos û mythologiyê tê sayîkirin, ji destana Gilgamêş beş hatiye



pêşkêşkirin. Nivîsa li ser Rexne û Teoriyên Wêjeyê di vê hejmarê de jî didome. Ev nivîs ji aliyê H. Kovvan Baqî ve ji tirkî hatiye werge-

randin. Di nav rûpelên kovarê de tekane çîroka nûjen ji aliyê A. Kahar Aksoy-Latîf Kara ve hatiye nivîsandin. Navê wê kurteçîrokê "Çîroka Apê Mûsa" ye. Di çîrokê de ji devê Apê Mûsa çîrokek gelêrî tê pêşkêşkirin.

Nivîsa Adar Jiyana bi navê "Ziman, Helbest û Helbestvan" wekî du nivîsên serbixwe xuya dike, yek li ser girîngiya zimên, a din jî li ser xisletên helbest û helbestvanîyê ye. Tişteki ku her du nivîsan bi hev ve girê bide nînin e. Di nava rûpelên wê hejmara Jiyana Rewşen de çîrokek gelêrî jî cih girtiye. Ev çîroka bi navê "Hesbilûr" jî hêla Dost Çiyayî ve ji herêma Amedê hatiye berhevkerin.

Ji bilî van nivîsan Kawa Nemir, Jana Seyda, Nûrê, Nesîm Kasirga, Şêxmûs Sefer, Berhîm Paşa, Dost Çiyayî helbestên xwe di vê hejmara kovarê de cih girtine.

SERWÎSA ÇANDÊ

Ji Hogir kasetayekemîn: "Pêt"

Kaset û CD'ya yekemîn a Hozan Hogir derket. Navê wê xebata hunerî ya hozanê NÇM'ê "Pêt" e.

Di vê xebatê de 12 stran cih digirin, hinek ji wan stranên


gelêrî, hinek jî berhemên Hozan Hogir û kesên din in. Piraniya stranên ku gelêrî ne jî ji aliyê Hozan Hogir ve hatine berhevkerin. Stranên ku ji aliyê Hozan Hogir ve hatine çêkirin, li ser doza welêt û azadiyê ne. Di nava xebatê de strana bi navê "Dayê" hem bi naveroka xwe, hem jî bi newaya xwe balkêş e. Dîsa helbesta strana bi navê "Oy Eman" mîna keke baş a wêjeya gelêrî ye.

Bingeha kasetê di bin rêveberiya Turhan Yayıstiran û Hasan Öcalan de hatiye amadekirin. CD û kaset navborî li tomargeha Soundê bi hevkarîya Kom Muzik û NÇM hatiye tomarkirin. Di vê xebata muzikî de orkestraya amûrjen, ji gelek amûrên gelêrî û nûjen pêk hatiye. Ji ber ku di stranên de şewaza gelêrî serdest e, amûrên gelêrî zêdetir derketine pêş.



Şehîd stêr in

HASAN KAYA



Di bêtî ew ji hespê bayî yê azadiyê peya bûye. Min hîç nedizanî ku "ba" jî diweste. Ma qey newal û mesîlk, zinar û çiya dikarin hespê ji bê biwestînin? Ma qey strî û pîj, kelem û dirî lingê bayê xurt dikulînin? Kalê nûranî xwe gihande hewara min: "Qeda bikeve bextê dinyayê. Bi tenê mirin bidad e. Qet cudahiye naxe navbera mirovan, bi yek hêzê li serdest û bindestan dixê", got. Piştî ku min ev gotinên kalo bihîstin, ez li ser hemû gotin û gotarên ku der barê mirinê de hatine gotin, hûr bûm. Bêhtir jî min xwest ku mirinên mîtolojîk bêne bîra min. Jixwe mîtolojîyê her gav bala min kişandiye ser xwe û ji ruhê min re bûye mîna sebr û qinyatê. Mesele, hîç jî bîra min naçe, di dema zarokatiya me de, ku mirovek dîmir, me digot stêra wî/wê ji ezmên dakete jêr. Gelek caran me bi xwe jî dibihîst, piştî mirinekê hinekan digot:

"Wele me bi çavê xwe dît stêrek xuricî, ma çima tu nabêjî ya bêvankes bû."

Wê demê min dikir nedikir, ez serwest nedibûm, gelo piştî mirinan ev stêrk li ku dicivin. Min tu caran ev pirs ji tu kesî jî nekir. Min di dilê xwe de digot, heke ez bersiva wê pirsê hîn bibim, dibe ku tilsîma di dilê min de xera bibe û ez nikaribim êdî stêrên ku dirijin jî bibînim. Wan şevên havînê em li ser têxt radiketîn, asîman şîn û sayî û tijî stêr bû, heta çavên min diqerimîn, min li stêran temaşe dikir. Bi vî awayî di xew ve diçûm. Li gorî bawerîya min a wê demê her stêrek mirovek bû.

A niha, van salên dawîn, meh û hefte nîn in ku xebera mirinekê ji me re neyê. Ewên ku em xebera şehîdbûna wan dibihîzin yek ne kême yekê/î ye. Jixwe mirov nikare wan bide ber hev. Mirina her lehengekî mîna ku rojek ji holê wînda bibe ye. Lewre her yek ji van pakrewanan hemû taybetiyên rind ên mirovahiyê di kesayetiya xwe de vedihewîne. Ji qirêjî û neçêyiyên dinyayê hatine dawerivandin. Pîr û pak in. Bi ava heyatê hatine şuştin û guneh ji wan dûr ketine. Hemû jî teyrê baz in. Mîna bazan cihê xwe li cih û warê bilind çêdikin.

Dema ku min xebera mirina hevalê Merwan bihîst, çawa ku min li jor got, hem gotar û peyvên wêcîz ên di barê şehîdan de hatin bîra min, hem jî ew serpehatiyên zarokatiyê di ber çavên min re çûn û hatin.

Kenê li ser lêva heval Merwanê ku ji yanzdehan vir de min nedîtiye, hê jî li ber çavên min teze û germ e. Kenekî bê bazar, ji dil û masûm. Ez baş dizanim, di nav van deh salan de, ew tevî refê xwe yê bazan li Mavan, li Hebizbinê, li Botan û li gelek cihên din ji bo gelê xwe yê ku bextê wî hatiye reşkirin, ji kaniya heyatê av hilçikandiye. Tevî hemû zor û zehmetiyan ez bawer dikim ku her dem beşera wî xweş bûye, yek kêlikê jî kenê ûryan, neşemirandiye lêva wî.

Merwan tevî pênc bazan mîna wan stêrkên geş ên di zarokatiya min de, ji asîmanê şîrkî yê dayîka me ya hêvîdar xuricîne. Ew goristanên wan ên ku a niha nediyar in, rojeke ne dûr li ser çiyayê Bagokê yê ku tu caran ji dagirkeran re serî daneniye, tevî goristanên hemû şehîdên me yê din dê bibine abîde. Ciwanên kurd ên azad wê demê de tacegulekê daynin ser gorên wan û dê sirûdên rizgariyê bistrînin.

Hiş dengê xwe neke

Rojekê leşker ji zindanê du girtiyan digirin û wan dibin, bi dar ve bikin. Zilamek ji wan nifiran li leşkerê dîke. Zilamê dinê dibêje:

- Kuro hişş! Dengê xwe neke, devê xwe bigire, tu yê serê me bixî belayê ha!

Belê xanima min

Zilamekî bi navê xwe Hesên, li Stenbolê dikaneke fêkiyan vedike. Di dikanê de her cure fêkî hene. Rojekê jinikek tê dikanê û dibêje: "Mûzên te yê çikîta hene?"

Zilam :

- Belê xanima min, mûzên min bêdendik in!"

Tiştêk bi ser wan de nehatibe

Li Mêrdînê îxbara çalakiyeke gerîla gihîşt leşkeran. Leşkeran li cihê ku wê çalakî pêk were kemîn danî. Piştî demeke dirêj gerîla nehatin. Li ser vê rewşê leşkerê got:

- Serleşkerê min ez dikarim tiştêk bibêjim?

- Fermo, bêje.

- Serleşkerê min, gerîla nehatin gelo tiştêk bi serê wan de nehatibe?

Efî

Li gundekî Midyadê zilamek cotê xwe dîke. Zilamek jî di rê de diçe û dibêje: "Quwet be ji te re, Efî."

Efî dibêje: "Sax bî, Xwedê ji te razî be, lê tu ji ku navê min dizanî?"

Zilam: "Kuro ma tu ne ew Eliyê ku wê salê li binxetê hate kuştin i?"

Cehşekî ker li kerê digere

Rojekê li Midyadê cehşek çû daristanê ku daran bibire. Li dibistanê çeka xwe li pişt kerê xwe girêda û dest bi birîna êzingan kir. Gava barê kerê xwe amade kir, dît ku ne ker heye, ne çek. Gelekî geriya, lê ne kerê xwe ne jî çeka xwe dît. Dûre hat gund, çû ser xênî û bang kir:

"Gundîno!... ha gundîno, kerekî bi çek wînda bûyee... Kerî bi çek wînda bûyee... yên ku bibînin bila bêjin ..."

BERHEVKAR: YUSUF ASLAN

Projeya balkêş

Dewleta tirk dîsa sînyal şand ser peyka MED-TV'yê, demekê weşana wê hate astengkirin. Xalê Bozan pirsî, got:

- Gelo ew sînyalê çawa dişînin?

Hevalê wî got:

- Wele bi qandî ku ez dizanim tîrêjan dişînin ser peyka ku weşana MED-TV'ê li ser tê kirin.

Zilam jî got:

- Welehî projeyeke min heye, heke teknîkerên MED-TV'yê pêk binin, hem ewê MED-TV'yê biparêzin, hem jî emê ji televizyonên tirkan rizgar bibin.

Hevalê wî got:

- Çi ye projeya te?

Wî got:


- Bila heval neynikekê bigirin destê xwe û herin li ser peykê rawestin, dema tîrêj hatin, bila berê wan bidin aliyê Türksatê.

Telefona Memed

Yekî telefon kir û got: "Memed li wir e, ji kerema xwe re bangî wî bikin." Hevalekê bangî Memed kir.

Memed li ser xwarinê bû, bang kir û got: "Bêjin Memed ne li vir e"

Mirovê ku telefon dikir got: "Kuro



wa ye dengê te tê min, çawa tu dibêji ne li vir e."

Memed jî got: Tu ji min bawer dikî, yan ji dengê min? Belkî dengê min ji televizyonê tê. Belkî jî min bi riya înternetê xwe gihandibe hevalan.

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (143) XAÇEPIRSA

Ş	A	B	A	F	Hir giran	S	A	Mî herdu	
Ş	E	E	C	K	Çarêkê	V	Î	R	
Ş	A	L	Paşeroj	A	R	P	Î	Î	
N	A	M	Paşeroj	R	O	K	Y	S	
D	Î	V	Î	S	Xerîyayê	T	D	A	S
Z	K	Wekîkî	R	A	N				
E	A	L	Qeymax	A	N	Î			
D	R	E	T	Î	S				
Î	N								

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 141'ê

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin destê me, em dê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 143'yan kasetê Hogir 'Pêt' e.


Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

HOGIR

Pênc kesên ku xelata hejmarê 141'ê Kasetê Nilûfer Akbal 'Rivingê' kezenê kirine ev in: Kenan Göçer/Tokat, Zafer Ekin/Stenbol, M.Hüseyin Doğan/Zonguldak, Hüseyin Ağaç/Semsûr, Celal Baysal/ Stenbol

Papaz	Kesê Hz. Eli diparêzin	Vegetandek	Ded. mam	Xanima Elişer	Newroz
Şehîdek (Wêne)		Rêwinda	Beyreq	Term. ceset	
	2				
İklîm.	Baneşane k	Tîpa li dû Q'yê	Xiyar		
	Kesê diçe ber pez		Kesê yekemîn		
			Ël, hoz		
			Enî. cephe		
Helbest	3	Kurtenivis a berî miladê		Baneşane k berepaşki	
Gihaneke k		Cinavkek		Tîpek	
	Televîzyon a gelê kurd	Li hemberî ewe Ehmedê	1	Ne avî	
				Daneki rojê	
Beşên xênî		Bersiva erênî			
Navekî mêran		Ji rê derketî			
			Baneşane k		
Sembola Hidrojenê	...Neteweyî			Tîpa pêşîn	
	Tîpa dû Kyê				
4	Bi kirdkî qirêj		Agir		



Derheqê Kirmanckî de Kombiyayîşê Çarine

Kulturê piyaxeftiyayîn û piyakarkerden ma kurdan miyan de kemî yo. Nê kemiyînî hema hema hemû kurdî, bi taybetî jî roşnîkarê ma kurdan anê zîwan. La belê qandê ciyayanê wardiyan pêser nînê û ciya ciya xeftiyenê. Bê çend nimûnan hewna jî wina yê. Nê nimûnan ra jew jî xebatê vetoxanê kovara VATE yo. Vetoxê kovara VATE nezdiyê vist kesî yê. Pêroyê jî teverê Welatî de manenê û wayirê fikir û vînanê ciya ciyayanê. Lo ma (feqet) nezdiyê di serî yo fikir û vînanê xo yê ciyayê estê jû kiştî û iyê qandê rastnûsten û standarîzîdekerdena lehçeya dimilî (kirdkî -kirmanckî) xeftiyenê. Nê vist kesî wext wext yenê pêser standarîzîdekerden û rastnûstena dimilî ser ro fikran û vînanê xo anê zîwan û meylanê hetbaran (ortak) tesbît kenê. Peynî de nê meylanê hetbaran Kovara VATE de vejenê. Nînan hetanî nika çehar (çar) kombiyayînî viraştî. Peyniya kombiyayîna yewîn û didiyîn zey brûşorî vetî ê hîrêyîn û çeharîn jî kovara VATE de vet. Ma peyniya kombiyayînî yewîn û didiyîn rojnameyê ma de weşeynabi, peyniya hîrêyînî de nameyê welatan, dewletan û paytaxtan ser ro vindartîbî nê jî cêr cor zey kurmanciyayê. Coka ma pêwîst nêdî peyniya kombiyayînî hîrêyîn biweşînim. Nika jî peyniya kombiyayînî çeharîn amorê kovara VATE ê hîrêyîn de weşiyayo. Ma yê peyniya kombiyayînî çeharîn (bê termanê îdarî û siyasî, çimki nê jî cêr cor zey kurmanci yê) weşînemî.

Derheqê Kirmanckî de Kombiyayîşê Çarine

Duburg, 10-13'ê nîsane 1998

Roja 10'ê menga (aşma) nîsane, şaristananê Almanya ra Duisburg de kirmanckî (kirdkî, dimilkî zazakî) ser o kombiyayîşê çarine dest pê kerd û çar rojî ramit. Nê kombiyayîşî de nê hewtês kesî amade bîy.

Yildiray Beyazgul	(Gimgim)
Lerzan Jandîl	(Gimgim)
Çeko Kocadağ	(Gimgim)
Aydin Bîngol	(Gimgim)
Elif Kiliç	(Dêrsim)
Huseyîn Kûlû	(Dêrsim)
Kamer Söylemez	(Dêrsim)
Mehmet Taş	(Dêrsim)
Kazim Temurlenk	(Dêrsim)
Mûnzûr Çem	(Dêrsim)
M. Malmîsanîj	(Pîran)
J. İhsan Espar	(Pîran)
Wisif Kaymak	(Pîran)

Huseyîn Girit	(Erzingan)
Seyidxan Kurij	(Çewlîg)
Selîm Mûrat	(Pali)
Şukrî Urgun	(Hêni)

Nê kombiyayîşî de amadebiyayoxî nê meseleyan ser o vindertî û meylê xo tesbît kerdî:

- *Kilmnuştayî (bi tirkî "kısaltmalar")
- *Herfa pêragirêdayene/ herfa pêrabestene (kaynaştırma harfi)
- *Îzafe (tamlama)
- *Sifetî ra name virastene (sıfattan isim türetmek)
- *Zafhûmarê nameyan (isimlerin çoğulu)
- *Çend edatî (birkaç edat)
- *Çend konjoksîyonî (birkaç bağlaç)
- *Mesderê fîlan (fiillerin mastarları)
- *Termê îdarî û siyasî (yönetim ve siyaset ile ilgili terimler)
- *Tîya de ma nê xusûsan de meylê kombiyayîşî nusenî.

I-KİLMNUŞTEYÎŞ

Çend kilmnuştayê ke no kombiyayîş de tesbît biy, nê yê:

kirmanckî (zazakî).....tirkî
b. (biewnîre).....bak
çc. (çimeyo corîn).....yagk. (yukarıda adı geçen kaynak)
env. (esero ke nameyê xovêreno)..age. (adı geçen eser)
ec. (esero corîn).....yage. (yukarıda adı geçen eser)
n. (nîyade).....bak
nc. (nuştayo corîn).....yagy. (yukarıda adı geçen yazı)
nnv. (nuştayo ke nameyê xo vêreno)..age. (adı geçen yazı)
r. (rîpel).....s. (sayfa)
ûêb. (û ê bînî).....vd.(ve diğerleri),
vb. (ve başkalari) vs.(ve saire)
ûsn. (û sey nînan)vb.(ve benzeri, ve benzerleri)

II) HERFA PÊRAGİRÊDAYENE (HERFA PÊRABESTENE)

Kirmanckî de nê di herfê pêragirêdayene estê: Y, W.

Nimûne :

Y...W gayan (ga+y+an),...gawû (ga+w+û), koyan (ko+y+an).....kowû (ko+w+û)
Nê nimuneyanê corînan de "ga" û "ko" yewhûmar (bi tirkî "tekil") ê. Gama ke nê kelîmeyî suffiksê zafhûmarîye (çoğul takısı) gênê, benê "gaan", "koan". Labelê semedo ke di vokalî (iki sesli) "a" û "a" yan zî "o" û "a" yenê tê hete, herfa pêragirêdayene dekewena miyanê nê di vokalan û benê "gayan"(ga+y+an) û "koyan" (ko+y+an). Tanî sîweyan de herfa pêrabestene "y" ya, tanî şîweyan de zû "w" ya, la.belê meylê kombiyayîşî nê her di herfan ra herfa "y" ser o yo.

Nimûne

meylê kombiyayîşî..... formê bînî.....tirkî
Gayan biyarê....Gawû biyarê.....Öküzleri getir

Kolan ra vewre esta..... Kowû ra vewre esta. Dağlarda kar var.

Hesen o yo, Roşan zî no yo.... Hesen o wo. Roşan zî no wo... Hasan budur. Roşan budur.

III) ÎZAFE

Eke kelîmeyê nêrî (bi tirkî "eril sözcük" } bi "e" biqediyoy, îzafe de no "e" nusiyêno.

Nimûne:

Meylê kombiyayîşî..... formê bînî..... tirkî
name, nameyê to.....namê to.....senîn adın

mele., meleyê hêgayanê ma..... melê hêgayanê ma..bizim tarlaların çizgisi

IV) NAME

Sifetî ra Name Virastene

Kirmanckî de car ra ca formê suffiksê sifetî ra namevirastene vuriyeno (bediliyeno). Tanî cayan de no suffiksê "-iyê" yo, labelê cayanê bînan de "ey", "ê" yan zî "-î" yo. Kombiyayîşê ma nê forman ra "iyê" tercîh kerd.

Nimûne: tirkî

îyê.....-ey, -ê, î.....lık

nêweşnêweşiye.....nêmeşey,

nêweşe, nêweşi.....hastalık

serbest.....serbestiye.....serbestey,

serbestê, serbestî.....serbestlî, özgürlük

(Dewamê cê esto)

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:

İstiklal cad. Asmalı Mesur sok. 35/32 N.308

Beyoğlu İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ İZAN
■ Berpîrsê Karêr Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
Rİ SALHI TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTYEN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mêrsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:

(Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:

İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Mazûbana şaristaniyên navdar û jîngeha Nûh Pêxember

Bajare Cizîrê

Li gorî saloxan Keştiya Nûh Pêxember li ser Çiyayê Cûdiyê sekiniye û Nûh Pêxember li Cizîrê bi cih bûye, ji ben vê yekê Sûrên Cizîrê ji layê Împaratoriya Gûtiyan ve wekî şekl û şemalên "Keştiya Nûh" hatine çêkirin. Tê gotin ku ev sûr 6000 sal berê angore berî zayîna Îsa bi 4000 salan hatiye çêkirin.

Dîrok

Piştî Tofana Nûh, li ser Çiyayê Cûdî "Mala Pêxember" hatiye avakirin. Piştê wekî devera duyemîn, Bajare Cizîrê ava bûye. Cizîra ku di dîrokê de mazûbaniya şaristaniyên wekî med, gûfî, babil, asûr, pers, Îskenderê Mezin, Selevkas, Kelt, Part, Sasanî, îslamî, Emevî, Ebasî, Moxolî, Selçûkî, Artûkî, Zengî, Mirîtiya Ezîzan, Akkoyunî û Osmanîyan kirîye, di dîrokê de bi navên wekî, Gerz û Barkarta, Gazarta Karday, Bazibda û Cezîr hatiye nasîn. Cihanê bajar wekî "Şarê Nûh Pêxember" bi nav kirîye.

Kela Cizîrê


Kela Cizîrê, li bakurê bajêr, li ber keviya Çemê Dijleyê hatiye avakirin. Kela ku ji 3 qatan û ji 360 odeyan pêk tê; tevî ku heta niha restore nebûye jî, azamet û bêhempatiya xwe ya sedan sal winda nekiriye. Zindanên Mem û Zînê di nav kelê de ne û ji eslê xwe tu tişt winda nekirine. Zindan ji qubeyan pêk tên û li ser deriyê hundir ê mezin xêzên xeza lan hen. Îro di nav kelê de, qesr, Mizgefta Mîr Sêvdîn, xwaringeh û biryargeha leşkerî heye.

Sûrên Cizîrê

Li gorî saloxan Keştiya Nûh Pêxember li ser Çiyayê Cûdiyê sekiniye û Nûh Pêxember li Cizîrê bi cih bûye. Ji ber vê yekê Sûrên Cizîrê ji layê Împaratoriya Gûtiyan ve wekî şekl û şemalên "Keştiya Nûh" hatine çêkirin. Tê gotin ku ev sûr 6000 sal berê angore berî zayîna Îsa bi 4000 salan hatiye çêkirin. Wekî ku pozê keştiyê bakur, paşîya keştiyê jî başûr nişan bide, sûr ava bûye. Deriyê torê û deriyê deştê wekî remza bîrên keştiyê hatine çêkirin. Ev her dû derî jî xera bûne, lê deriyê ku figûrên şêr li ser in hê jî qewîn e. Ji hêla Fermandarê Sasanî Erdeşêr Babekan (B.Z. 241226) ve xêzên şêran li ser derî hatine danîn û kitabeyek lê hatiye zêdekirin. Derî ji 3 kevirên mezin pêk hatiye, piştê hin kitabe û xêzên şêran lê hatine zêdekirin. Sûr ji kevirên reş ên bazalt hatine çêkirin. Ji xeynî "Birca Belek" tevahiya bircan gilover in.

Birca Belek

Bi taybetiya xwe ya ku rêzek ji kevirên reş, rêzek ji kevirên spî ye ji wan bircên din tê veqetandin. Birca Belek di sala 1596'an de ji aliyê Mîrê Ezîzan ê Cizîrê Şerefê Mihemmedê Xan Evdal ve ji bo bîranîna bapîrê xwe Mîr Belekê Behram hatiye çêkirin. Mîr Belek piştî ku Xarpêtê distîne, navenda mirîtiya xwe ji Cizîrê dibe Xarpêtê. Îro li Xarpêtê bi



navê "Belek Gazî" peykerê wî heye.

Pira Bafidê (Pira Yafes)

Pir di sala 1164'an de ji layê Cemaleddînê Îsfehanî ve ku yek ji wezîrên dewleta Zengîyan bû, hatiye avakirin. Pir bi navê Yafes û Cezereî Omer jî tê nasîn. Yafes navê kurê Nûh Pêxember e. Li ser pirê figûrên Eshabül-keyf û birc hene.

Muzeya Cizîrê

Muze di sala 1996'an de ji aliyê Midûrê Dibistana Seretayî ya Îsmail Ebûlîz (Ebulîz İlköğretim Okulu) Abdullah Yasin ve hatiye avakirin. Di muzeyê de bi sedan berhemên arkeolojîk û etnografîk hene. Tê gotin ku berhemên li muzeyê li ber çavan tene raxistin ji demên med, gûfî, babil, asûr, îslam, Emevî, Ebasî, Selçûkî, Ezîzan, Zengî, rûm, ereb û ji Osmanîyan mane.

Tirb û Mizgefta Nûh Pêxember

Hiz. Nûh Pêxember ku navê wî di 3 pirtûkên pîroz de angore di Quran, Tewrat û Încilê de wekî bavê duyemîn ê mirovahiyê derbas dibe, li gorî Sureya Hûdê ayeta 44'an a Quranê, Hiz. Nûh tevî keştiya, xwe piştî Tofanê li ser Çiyayê Cûdî daniye û li Cizîrê wefat kirîye. Disa li gorî çavkanî û saloxdayînan di nav pêxemberan de yê ku herî zêde jiyaye û tengasî kişandîye ew e.

Li gorî baweriya olî, mirovahî jî wî û ji 3 za-

rokên wî Ham, Sam û Yafes zêde bûye.

Mizgefta Mezin (Ulu Camî)

Piştî pejirandina îslamê, di sala 639'an de ji dêrê bûye mizgeft. Di dema Ebasîyan de, ji binî ve hatiye rûxandin û ji nû ve li gorî demê hatiye çêkirin. Di sala 1160'an de ji aliyê El Sencerê kurê Mîrê Cizîrê Baz Şah ve ji nû ve di bin destan re hatiye derbaskirin. Mînareya ku di sala 1156'an de li ser 4 koşeyan hatibû avakirin; di salên 1945–1946 û 1971'ê de hatiye tamîrkirin. Li ser deriyên mizgeftê figûrên navdar ên ejderê ku ji layê Ebûlîz ve hatine çêkirin hê jî ihtîşama xwe diparêzin. Yek ji wan figûran îro li Muzeya Türk-İslam a Stenbolê ye.

Medresa Sor û Tirba Melayê Cizîrî

"Medreseya sor" di sed sala 15'an de ji aliyê Mîrê Ezîzan, Mîr Şeref ve hatiye avakirin. Ji ber ku ji tuxleyên sor hatiye avakirin ev

nav lê hatiya danîn. Mescît ji beşên îdarî, feqîtî, mamos-teyî û ji kulliyeyê pêk tê. Melayê Cizîrî ku tirba wî di nav medreseyê de ye; helbestvanekî navdar ê gelê kurd e ku di navbera salên 1404-1479'an de jiyana xwe domandiye. Helbestvanê navdar Cizîrî, di qesîde û helbestên xwe de mijarên neteweyî, olî û tesawûfî hildaye dest. Dîwanake ku ji 2000 beytan

pêk tê, nivîsiye. Antolojîyên wî yên helbestan bi navê "Gûftiyên Meleyan" û "Gûftiyên Mîr" hene. Di nav lîteratûra edebiyatê de jî bilî navê "Şêx Ehmed El Cezerî" bi navê "Nîşanî" jî tê nasîn.

Tirba Îsmail El Cezerî

El Cezerî di sala 1153'yan de li Cizîrê hatiye dinê. Ew bi xwe fizîknas e û danêrê 60 makîneyan e. Di nav îcadên wî de robot, bîngeha kompîtûran, saet, makîneyên avê, mûsîq, mifte û pêlîstokên zarokan hene. Li cîhana rojhilat û rojava gelek caran wekî "Bave Teknolojîyê" hatiye binavkirin. Di 1233'yan de wefat kirîye û tirba wî îro di hewşa "Mizgefta Nûh Pêxember" de ye. Pirtûkên wî bi salan li zanîngehên Ewropayê jî bo perwerdehiyê hatine xwendin.

Mem û Zîn

Medreseya Mizgefta Mîr Evdal

Medreseya Mîr Evdal wekî "Medreseya Evdaliyê" jî tê naskirin. Di sala 1437'an de ji aliyê Mîr Evdilayê neviyê Seyfedînê Botî ve hatiye çêkirin. Mizgeft û hin odeyên îdarîyê li ber hemû nexweşîyan li ber xwe didin û peywira xwe îro jî bi cih tînin. Tirbên Mem û Zînê ku lehengên manzûmeya Şêx Ehmedê Xanî ne û tirba Bekoyê Ewan ku li ber evîna wan a pîroz bûbû kelem, li başûrê mizgeftê dikeve.

Mirate û kavîlên Qesrîk

Bermahiyan bajêr, freskên ku li ser tehtan hatine çêkirin, bendên avê, tehtên xwezahî û Xerabe û Mîrateyên Qesrîk ên ku li ser rîya Şîmex û Cizîrê dikevin, îro xwediyê dîrokeke 4000 salî ne.

*Mesafeya di navbera Cizîrê û hinek deveran de

Şemex 44 Km., Mêrdîn 150 Km., Amed 244 Km., Riha 243 Km.

Êlih 141 Km., Dilûk 455 Km., Deriyê Xabûrê 45 Km., Deriyê Nisêbinê 94 Km.

SALIHÊ KEVIRBIRI

Çavkanî: * Pirtûka Abdullah Yaşin bi navê "Cizre"
** Ansiklopediya Britannica
***Hin katalogên bajêr ku rayedarên herêmi dane madekirin.

